

# WELAT


**H**

unermend û  
huner di riya ku  
şoreşa kurdî vekiriye re  
derketine ser qada  
jiyanê. Belkî pirên wan  
hê jî li piştä şoreşê  
bar in.

Li dinyayê di nav gelên  
bindest de hunermend  
riya şoreşê vedike. Li vir  
şoreşê riya hunermen-  
dan vekiriye û bi destê  
wan digire.

Em muzîkeke sentez  
çedikin, niha çêkirina  
muzîkeke bi vî rengî di  
eynî wextê de  
navneteweyîbûnê,  
bi xwe re tîne.  
Bikaranîna amûrên  
gelêrî di muzîka kurdî  
ya gelêrî de bi xwe re  
neteweyîbûnê nayne.  
Yanê hûnê xwe çawa bi  
keseñi Ukraynayî bidin  
fêmkirin.

Rûpel 8-9



**ŞOREŞE RIYA**  
**MUZİKA KURDISTAN**

● Nûçeya li ser serlêdana dozgerê DGM'ê ji bo girtina HADEP'ê, bi sernavê

"Tirkiye bûye goristana partiyâ" Rûpel - 3

● Nivîsi, ZÜLKÜF KİŞANAK bi kirmançî Şehîd Bêrîvan Türkmen Demirel, bi bir tîne, "Embaza Bêrîvan  
Türkmen Demirel" Rûpel - 6

● Nirxandina Fermandarê ARGK'ê ŞEMDÎN SAKIK li ser rewşa şerê li başûrê Kurdistanê peyivî  
"Jûjî bi dûvika mar girtiye" Rûpel - 15



Çiya Mazî: Koçberiya demsalî

4

Azad Altun: Bi çavêner amerîkiyan  
Şerê IRA'yê

7



Hawaryûm: Diya min ne şehîd e

14

## Ji Xwendevan

Ji azadî û serxwebûnê çêtir tiştek nîn e, ji wan azadiyan jî yet a azadiya ziman e.

Çawa ku tiştekî mîrovan pir şîrîn wîndâ dibe, ên ku dibînin, mîzgîniya wan tiştan pêşkêş dikan, lê ez bawer im ji kurdan re wesana Azadiya Welat hem mîzgîni û hem jî azadî ye. Yen ku nahîlin bê xwendin, dijmin in.

Eger ji mîe baştir bixwîne û roj bê wê bibêje ev tişt jî malê me ye. Çawa ku li kesk û sor ên me dibin xwedî, çawa ku li Newroza me dibin xwedî.

ZÜLFİKAR KORKMAZ

**EZ** xebatkarekî komela karmandan im. Ev şes meh in ku ez bi kurdî dixwînim û ev nameya yekemîn e ku ez ji we re dişinim. Bi taybetî rûpelên nûçeyan, rûpela pêkenokan û rûpela xaçepirsan pir xweş e. Hîn kêmâsiyên min pir in. Lî belê ezê miheqeq hînî zimanê dayîka xwe bibim. Ji ber wê yekê jî ez dixwazim rojname tim derkeve.

Me ji Rojnameya Demokrasi pir hez dikan. Bi girtina wê em pir xemgîn bûn. Bira dijmin zanibe ku pêkutî wê nikare me bide sekinandin û yet here wê dudü bênen. Banga min ji xortan re, zimanê me pir xweş e, divê em hînî zimanê xwe bibin.

YILMAZ DEMİRCİ



## Moşek û brîfîng

SAMÎ TAN

**A**rtêşa tirk di dîroka xwe de tevgera herî mezîn li hemberî tevgera kurd di 14'ê gulanê de da destpêkirin. Vê tevgerê wisa ji nişka ve dest pê nekir, pişti amadehiyên dûr û dirêj dest pê kir. Berî ku tevgera dagirkirina başûrê Kurdistanê dest pê bike, hêmû rojnameger ji herêmê hatin dûrxistin.

Lê pişti daxuyaniya yekemîn a Sekreterê Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk, rojname û televizyonê tirk dest bi nîvîsandina destanê serkeftinê kirin. Pêşî hejmara gerîlayênu ku hattine kuştin wekî 40-50 nîşan didan, ji nişka ve ew hejmare bi sedan hate ifadekirin. Li hemberî vê yekê rojnamegeren biyan dev ji weşandina nûçeyen kû çavkaniya wan artêşa tirk e, berdan. Dema ev nûçê weşandin jî li nik wê cih dan nûçeyen MED-TV'ye ji.

Mîrov dikare bibêje artêşa tirk berî têkçûna di ser de, di vî warî de têk cû. Lewre berê, kêm căran ajansên nûçeyan ji agahiyêwan diketin gumanê û ci bûyerên ku wan bi xwe neşopandibûn li gorî agahiyênu ku ji çavkaniyên tîrkan-dihatin, diweşandin. Pişti vê bûyerê girîngiye medya kurd derket holê. Jixwe Serkaniya Giştî ji vê yekê bêhaydar nîn bû, lewre ji berî tevgera dagirkirine, rojnameya Demokrasiye bi awayekî ne-qanûnî hate girtin.

Li aliye din bêrxwedana gerîla bandor li helwesta hêzên kurd ên başûrî jî kir, gelekkî hêzên welatparêz li hemberî vê tevgerê denge xwe bilind kir, heta li gorî agahiyen YNK'ya ku di destpêkê de dengê xwe dernevîst jî, pişti demekê li hemberî tevgerê derket. Piş re jî PDK'ya ku li gorî daxuyaniya rayedarê tirk, ew vexwendibûn herêmê, rînşandariya wan dikir û li Hewlîrê tevkujiyek li dijî mîrovê welatparêz pêk anîbû, zîmânê xwe guhart. Wê jî da zanîn ku wan bangî artêşa tirk nekiriye, xwedîgiravî ji bo ku hêzên tirk nekevin Hewlîrê wan êrîş bîriye ser binechîn PKK'ê.

Helwesta çapemeniya tirk a li hemberî hevalbenda wan PDK'ê ji gelekkî balkêş e. Çapemeniya ku nûçeyen xwe li ser daxuyaniyên Serkaniya Giştî amade dikir, hê di destpêkê da nîşan da ku bi ci çavî li kuftan dînîhêre. Lewre hê di destpêkê de hate ragihandin ku PDK li hemberî gerîla têk diçe, lewre ji artêşa tirk leşker şandine hawara wan. Li aliye din hîn di roja yekemîn de çapemeniya tirk kîrinê li Hewlîrê bi temamî xistin stûyê PDK'ê û ew kîrin, wekî qetşam bi nav kîrin. Divê kurd ji vê helwestê dersê wergirin, lewre dewleta tirk ji bo kesen ku jê re xulamîtiye dikin jî ne rast û durist e. Jixwe camêr dibêjin, "em li dijî her cure kes û saziyê ne ku ji

bo kurd yetiyê xebatê dikin."

Helwesta PDK'ê pişti vekişîna bi sedan pêşmerge û cerdevanênu ku naxwazin şer bikin, nermtir bû û di dawiyê de pişti ketina helikopterên tîrkan û têkçûna hêzên tirk, niha-jî li gorî agahiyen Barzaniyê ku bi zimanê faşîstên tirk dipeyiye û şervanê kurd weki terorist bi nav dikir, pê hesiyaye ku "PKK ev 15 sal in li bakurê Kurdistanê ji bo azadiya kurdan şer dike."

Artêşa tirk jî heke mîrov bi gotina Erbakan bibêje "heyfa têkçûna xwe dixwazeji Partiya Refahî bistîne", li ser hev brîfîngan dide derdorê cur bi cur. Tê gotin ku di brîfîngâ davîn de generalên tirk li derdorê İslâmî gef xwarine û ew wekî hevalbendê PKK'ê bi nav kirine. Di tirkî de gotinek heye, dibêjin "Yavuz hîrsiz ev sahibini bastırır (Dizê jêhaşî xwedîyê malê dide girtin)" helwesta artêşa tirk vê gotinê tîne bîra mîrov û heta ku hêzên demokratik ji wê, hesabê kîrinê nemirovî yên bi salan nepirsin, ewê ya xwe bi ser ya xelkê bixe û civakê bike şîrîk súcen xwe.

\*\*\*

Xwendevanê hêja berî vê bi çar hefteyan, ji bo hînbûna bîr û ramanê xwendevanê li ser MED-TV'ye, me dest bi weşandina anketekê kir. Hinek bersiv gîhîştin destê me, lê-em dixwazin her xwendevanê me vê anketê dagire û ji me re bişîne. Pişti demekê eme encama anketê di rojnameyê de biweşînîn. Ev derfetek e, ji bo kesen ku dixwazin hest û ramanê xwe bînîn zîmîn. Bila em tim nebin mijara anketê xelkê, de kerem bikin, rahêjin pêñûse,

## Wê hêlîna xiyanetê bê hilweşandin

ALAATTİN AKTAS

**E**v bû 50 sal, li her çar perçeyen welatê me, kengî şîfleke serxwebûn û azadiyê hêşin bûbe, Barzanî û partiya wî çûne ew şîtil ji bo mîtingeran jêkirine û perçiqandine. Kengî gelê me çira azadiyê pêxistibê û li riya azadiyê geriyabe, ev welatfîroş ji bo tefandina vê çirayê xebitiye û hetanî iro gelê me di tariyê de-hîstiye. Kî ye Barzanî û çi dixwaze?

Di dema Komara Mehabadê de, pişti ku li rojhîlatê welêt PDK hate damezrandin, di sala 1946'an de Barzanî jî li başûrê welêt, di bin serokatiya xwe de hemû rîxistin û hêzên welatparêz danê hev û PDK damezirand. Bi vî awayî PDK bû wekî enîyeke neteweyî. Lî belê bandora Barzanî û ramana eşîrtiyê di nav PDK'ê de pir xurt bû. Lewma dixwazin wî bi otonomiyê hate sinorkirin, bela ku otonomî ji berjewendiyen eşîrtî û malbatî re bes bû. Hinek hêzên pêşverû û rewşenbîrên serxwebûn û azadîxwaz, carina ku dengê xwe bilind dikirin û doza serxwebûnê dikirin, ji aliye hêzên Barzanî ve yet bi yet dihatin kuştin û telifandin. Hêdi hêdi PDK bû partiya eşîra Barzanî û hêzeke paşverû. Berjewendiyen neteweyî hâtin terikanîn û her tişt li gorî berjewendiyen eşîr û malbatî Barzanî hate sazkirin.

PDK wekî ku di nav xwe de kete seriya kevneperestiyê, li derve jî têkiliyên

Lê belê vê carê xayîntî û nokeriya Barzanî kar nake; ew çîqasî xayîntiya xwe kûr û fireh dike, hêzên rîzgariyê xurtir dibin; gelê me yê başûrê mezin jî roj bi roj ev xayîn bêtir nas kir û di nav refîn rîzgariya neteweyî de her roj pirtir cih digire.

xwe bi dugel û hêzên pêşverû re birîn û bi hêzên kevneperst ên dagirker û împeryalist re têkiliyên xurt danîn. Bi vî awayî PDK ji gelê kurd qut bû û hêviyên xwe bi împeryalîstan û dagirkeren tirk û ecem ve girêdan; berjewendiyen xwe di nokeriya wan de dîtin. Roj bi roj kete bin hikmê CIA, SAWAK û MIT'ê. Çîqasî di nav têkiliyên nokerî de bi pêş ve çû, ew qasî jî li dijî hêzên serxwebûn û azadîxwaz dijminatiya wê mezin bû.

Ji bo berjewendiyen dagirkeran li ser ked û xwîna gelê me dest bi bazirganiyê kir. Edî ev partî li temamî bû hîlîna xiyanetê. Li dijî gelê me, bû xencerek destî res; kengî gelê me ji bo serxwebûn û azadiyê serî hilda, dijminen dagirker, ev xencera zengarî di nav pişta gelê me de çikand.

Li dijî gelê kurd sîcûn PDK'ê û Barzanî bêhesab in. Carina hêzên welatparêz û şoreşger dîl girtine û teslimî dûge-lîn mîtinger kirine, carina ew bi hev dane kuştin û gelek caran jî wê bi xwe ew kuştine. Li ser xwîna şehîden Helepçe, li ser fedakarî û xwîna serhildana 1991'ê bi dijminê gelê me re bazirganî kiriye û welatê me pêşkêşî împeryalîstan kiriye.

Di destpêka şoreşer bakur de PDK'ê ev rista xwe demand. Wekî tê zanîn di

sala 1992'yan de da pêşiyâ artêşa dagirkeran û êrisi ser hêzên rîzgarixwaz kir; xwîna gelek keç û xorten me yê dilovan rijand. Gelek carên din jî, şervanê azadiyê û welatparêz dîl girtin, teslimî dijminen dagirker kîrin, an jî dîsa ew kuştin.

Lî belê vê carê xayîntî û nokeriya Barzanî kar nake; ew çîqasî xayîntiya xwe kûr û fireh dike, hêzên rîzgariyê xurtir dibin; gelê me yê başûrê mezin jî roj bi roj ev xayîn bêtir nas kir û di nav refîn rîzgariya neteweyî de her roj pirtir cih digire.

Pişti van hemî xayîntî û nokeriyen wî jî serokê tevgera azadîxwaz gazi Barzanî kir û jê xwest ku dev ji xiyanetê berde da ku ew ji bo doza neteweyî bi hev re xebatê bikin. Lî belê, wekî Xarpago, wekî İdrîsê Bedlisî, oi dirustî bersiva vê bangê nedâ. İro dîsa ketiye pêşiyâ artêşa mîtinger û êrisi ser hêvî û miradîn rîzgariya gelê me dike.

Lî belê, dem ne dem û dêwranâ berê ye. Partî û artêşa rîzgariyê, ne Seîd Elçi û hwd. ne. Vîna me ya neteweyî bi giyanâ tolhildana dîrokî hatiye pêçan. Artêşen rîzgariyê wekî lehiya sor bi ser dagirker û xayînan de diherike. Roja belavkirina hîlîna xiyanetê hatiye.

**CALAKIYÊN** xwefedayî ku PKK li dijî hevkarên dagirkaran pêk tîne, didomin. Cara dawî roja 10'ê pûşperê li Hewlîrê gerîlaya bi navê Dîcle, xwe avêt nava pêşmergeyên PDK'yî û bombeya li ser xwe teqand. Di encama vê teqînê de 6 PDK'yî hatin kuştin. Li gorî agahîyan hêzên PDK'ê li Hewlîrê avêtine ser malekê, li wir di navbera du gerîlayen ARGK'ê û PDK'yîyan de şer derketiye. Di bûyerê de gerîlayê mîr tê kuştin, gerîlaya keç jî pişî ku cebîlxaneya wê diqedê vê çalakiyê pêk tîne. Li gorî Ajansa IRNA di 15 rojê dawîn de 4 çalakiyên xwefedayî ji hêla gerîlayen PKK'ê ve hatine lidarxistin, di encamên wan êrişan de jî 55 PDK'yî hatine kuştin.



**KESÊN** ku hefteya borî li Enqereyê xwestibûn ku ji bo protestokirina Başûrê Kurdistanê çelengên reş deynin ber deriyê Bayozxanaya Amerikayê û di encam de jî hatibûn girtin, hate daxuyandin ku wê ji hêla DGM'ê ve bi sûcê "piştevaniya PKK'ê" bêne darizandin. Wekî tê zanîn wê rojê zêdetir 400 kes, ji hêla tîmîn taybet ve hatibûn girtin, pişî berdana gelekan ji wan, 67 kesen ku nehatine berdan, dest bi greva birçibûnê kirine. Di nava vê çalakiyê de digel Serokê HADEP'a Enqereyê Kemal Okutan, gelek rewşenbir û nûnerên saziyên demokratik cih gitibûn.

## NÛÇE

# Türkiye bûye goristana partiyâ

**Bozlak bi bîr xist ku, DGM berî vê jî, li ser heman delîlan ji Serdozgeriya Dodgeha Bilind girtina HADEP'ê xwestiye, lê ev yek nehatiye pejirandin. Serokê Giştî yê HADEP'ê Bozlak da zanîn ku niha li rastê ji bo HADEP'ê doza girtinê nîn e. Bozlak li ser biryara girtina DGM'ê jî diyar kir ku endamê DGM'ê yê leşkerî li dijî girtina HADEP'ê deng daye.**

**P**işî dagirkirina başûrê Kurdistanê, êrîş û çewsandinê dewleta tîr li ser saziyên we-latparêz û demokrat zêdetir bûn. Wekî tê zanîn, berî sazkirina operasyonê, 'Rojnameya Demokrasi' hatibû girtin. Her wiha hefteya rabûrî pişî şaxa İHD'ya Amedê ya Meletiyê jî hate girtin. Lî, rûdana girfingirin daxwaza ragirtina HADEP û cezayênu ku li rîveberen wê hate birîn bû. Tişte bal-kêş ev e ku, ev biryara di roja ku helî-kopter li başûrê Kurdistanê hate xistin,

derket. Digel vê yekê, têkiliya vekirina doza girtina HADEP'ê bi hilbijartinê re heye. Edî Türkiye wekî goristana partîyan tê binavkirin. Bo nimûne heta niha li Tîrkiyeyê 53 partî hatine girtin, di serdema naziyan jî li Almanyayê bi têne du partî hatine girtin.

Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak li ser pirsa me daxuyand ku di vî warî de DGM ne rayedar e. Bozlak bi bîr xist ku, DGM berî vê jî, li ser heman delîlan ji Serdozgeriya Dodgeha Bilind girtina HADEP'ê xwestiye, lê ev yek nehatiye pejirandin. Serokê Giştî yê HADEP'ê Bozlak da zanîn ku niha li rastê ji bo HADEP'ê doza girtinê nîn e û wiha got: "Lî, ku daxwaza wê pêk bê, ev ji bo demokrasiya Tîrkiyeyê tiştekî erêni bi xwe re nayine. Her wiha parêzeren me ji bo temyîzkirina biryara serî li Serdozgeriya Dodgeha Bilind dane" Bozlak li ser biryara girtina DGM'ê jî diyar kir ku biryara bi awayekî piraniya dengan (rey) hatiye girtin û endamê DGM'ê yê leşkerî li dijî girtina HADEP'ê deng daye.

Li ser heman mijarê Serokê

Partiya Guherîn û Demokrasiyê (DDP) yê ku hatiye girtin İbrahim Aksoy wekî bersiva pirsa me bal kişand ser daxuyanîyen Yekta Güngör Özden ên wekî "Hûn vî karî bispêrin min, ez di nav 6 mehan de çareser bikim" û "kes nikare bi min bide pejirandin ku, li Tîrkiyeyê dodgeh serbixwe ne" û da zanîn ku Özden li cihanê di warê girtina partîyan de ji hemû rekoran boriye. Aksoy wiha axivî: "Tu dibêjî ka beloh (Çig köfte) distre û dibêje amade ye werin bixwin. Li Tîrkiyeyê xwîna demokrasî û sistemê li hev nakin."

Nivîskar û navberkarê astiyê İsmail Nacar jî pîrsen me bi şeweyekî gîlover bersivandin û diyar kir ku ji ber statuya xwe, ew dikare wisa bipeyive. Nacar daxuyand ku divê li hemberî partîyan ku xelet û şas tevdigerin li gorî pîvanen demokrasiyê helwest bê girtin. Nivîskar Nacar wiha got: "Bi piranî hemû rojê min li meclisê derbas dibin, ez bi rîveberen dewletê re diaxivim. Ci dikeve ser milê min ez dikim. Li ser girtina HADEP'ê hel-



westen cur bi cur hene."

### İsmail Nacar: Li Tîrkiyeyê bêserûberî desthilatdar e

Serokê DDP'ya ku hatiye girtin Aksoy li ser nîrîna dewletê ya ji bo çereseriya kîşeyâ kurdî jî dîtinê xwe bi vî rengî anîn zimên: "Di nîrîna dewletê de ya ji bo çareseriya kîşeyâ kurd de tu guherîn pêk nehatiye û ji berê tûjtîdibe. Lî, nema dikarin bi ser bikevin. Ji ber ku kîşeyâ kurd bû kîşeyeyeke navneteweyî." Li ser vê mijarê Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak jî daxuyand ku di nêziktêdayîna dewletê de tu guherîn pêk nehatiye.

Lî İsmail Nacar bi awayekî din nêzîki mijarê bû. Nacar bal kişand ser desthilatnebûn û xemsariya TBMM û da zanîn ku di vê pêvajoyê de li Tîrkiyeyê bêserûberî desthilatdar e. Nacar wiha berdewam kir: "Gava hukûmeteke zana û ji dil bê damezirandin ev kîşeyê wê bê çareserkirin. Lî, ez dikarim bi hîsanî bibêjim ku hin kadro û saziyên dewletê ji hukûmet û meclisê pêşverû û demokratir in." Li gorî Nacar Tîrkiyê ber bi kaoseke mezin ve diçe.

MAZLUM DOĞAN

### Prof. Dr. Kadir Cangizbay: Dewlet wekî gêjan tevdigere!

**M**amoste hûn biryara DGM'ê ya der barê HADEP'ê de çawa dinixînin? A rast, ew nizanin ci dîkin! Bo gihiştinê armanceke dewletê nîn e. Wekî kerkedanekî (gerdêdan) har dibeze û tiştekî nabîne...! Wekî ku tê zanîn kerkedan sewalekî (heywan) ku baş nabîne ye. Ku armanceke dewletê hebûya wê tê bigîştâ ku ev politika dê dawiya wê bînîn. Her wiha wê pê bîhesiya ku, girseya gel berevajî daxwaza dewletê, ji tîrkperweriya dewletê direvin. Mirov wekî çareseriyeke erzan û hênsantir xwe dispêrin îslamperweriyê. Jixwe tîrkperweriya van kûçikiya Oçaxê Ülküçüyan el Birazîyê

Erbaikan bêhemd li Almanyayê ev rastî baş anî zimên û got 'li şûna tîrkîtiya ku her kes jê nefret dike, ez li şûna wê nasnameyê İslambûne hildibijerim.' Ji ber kirînê dewletê mirovîn hêja û birûmet ji tîrkperweriya ku dewlet diparêzê, direvin. Ji van mirovan ên zana û hişyar, sosyalîzmê diparêzin...

*Pîşî van bûyeren dawîn, bi dîtina we dewlet dixwaze kîşeyâ kurd çawa çareser bike?*

Qet ne xema wan e! Naxwazin çareser bikin. Lewre ji bo ku li Tîrkiyeyê sistemeke faşîst bidomînîn, dixwazin taybetiye tevgera kurd a anti-faşîst ji ber çavan dûr bixin û bi vê yekê nakokîya kurdayefî û tîrkîtiye derxin pêş. Hewl didin xwe ku tevgera kurd wekî tevgereke li dijî tîrkan nîşan bidin û bi vî awayî gel dijî "dijminekî derveyî" seferber bikin. Jixwe ji

bo van li cihanê dewleteke ku ne 'dijminê derveyî' ye nemaye.

*Bi dîtina we dewlet dixwaze HADEP'ê li derveyî hilbijartinê bîhêla an na? Her wiha di navbera girtina RP û HADEP'ê de tîkiliye heye?*

Wekî min li jor anî zimên, ew tiştekî bi awayekî plankirîn jî bi zanayî nakin. Niha dixwazin hebûna şerekî bi civakê bidin pejirandin û bi vî awayî dixwazin wan dengen ku derkevin bifetişînin. Ji ber ku di dema şeran de hêzên dijber qels dikevin. Mirov dikeve girtina HADEP di vê çarçoveyê de binixîne. Lî, divê ez dîsa bibêjim ku ew wekî nezan û gêjan tevdigerin. Li ser girtina RP jî ez dikarim bibêjim ku dewlet ji RP'ê natirse. Lî, bi wan hereşeyen (tehdît) derewîn dixwaze tişten ku nikare bike, pêk bîne.

# Koçberiya demsalî

**Belê... İro rojek ji rojên gulanê ye xelk li nava bax û baxçeyên xwe ne, lê gundiyan kurd baxçeyên xwe dihelin û bi stûxwarî diherin li baxçeyên biyanan, li nava erdê biyanan dixebeitin. Darê fêkiyan û rezên tiri jî bi melûlî li dûv wan hêstiran dibarşin. Çem û şikeftên ciyayên wan jî bi kulman li serê xwe didin.**

**İ**ro dîsa rojek ji rojên bîharê ye. Rojeke gulana 1997'an. Dîsa gelê kurd xwe amade dikin ku bi ser riya bikevin. Gelê kurd di dîroka xwe de tim li ser riyan e û koç kiriye, hey koç kiriye. Lê behsa koçkirina dîrokî û koçkirina ji ber pêkutiya serdestan pir hatiye zimên û hatiye nivîsandin. Lê belê koçkeke din heye ku dilê mirov dişne. Ew jî koçkirina ji bo kar, ji bo gezek nan e.

Hinek ji gundêñ xwe derketine, lê ji welatê xwe bi dûr neketine. Li navcê û bajarêñ welêt kom bûne. Dibêjin qet nebe ev never jî welatê me ye. Ewêñ ji gundêñ xwe, ji bax û bexçeyên xwe bêpar man e û bêkar in, xwe amade dikin û bîharî bi ser riyan dikevin. Ji bo debara salê. Ji bo tevrika pembo, karê bindeqan, karê daristanan, berhevkirina bacan, kartol, xiyar û zerdeyên din. Ji meha gulanê bi rî dikevin û diherin bajarêñ Tîriyeyê wekî Izmir, Edene, Manisa û Adapazariyê, hetanî payîzê li van deveyan dimîn. Payîzê çinîna pembo derdi-keve. Venagerin malê, îcar heta serê zivistanê pembo diçinir. Li dûv çinîna pembo, hinek vedigerin hinek jî zivistanê li serê çiyan karê daristanan û wekî din dikin.

Gelek ji wan salê sê mehan têne li welêt li nava zarokêñ xwe rûdinin. Îcar emê vê pirsâ herî dilşewat bikin: Gelo karê wan li gundêñ wan tune ye? Niha bi vê pirsê re axîn ji dilê gelek mirovêñ kurd û ji dilê Ciayê Bagokê, Ciayê Mazî, Ciayê Herekol, Ciayê Cûdî û ciyayêñ din tê. Niha hemû wiha ditejin: "Axx kula me ya herî giran!.."

Belê, karê gelekan heye. Bax û baxçeyê wan dar û daristanêñ wan fêkî û zerdeyên wan jî hene. Lê sed mixabin li dû xwe dihelin û diherin. Gelo bi hêsanî û ji kêfa diherin? Na... Ji ber pêkutiya dewletê û pêkutiya neyaran. Hinek ji wan rezên wan, baxçeyê wan, erd û zeviyêñ wan ne serî û ne dawî heye. Heke derfet hebûna, qet hewce nedikir ji bo gezek nan bi ser riya bikevin. Qet ew pêkutiya li ser riyan û cihê biyan nedikisandin.

Qedera gelê kurd qedera welatê wan bi hev re girâdayî ye. Çawa welatê wan tim di bin destan de ye û hemû dewle-mendî dihere ji mêtîngoran re. Keda wan jî bi erzanî dihere ji mêtîngoran re.

Hûn bala xwe bidinê, gelo çawa erdê mirov, rezê mirov û baxçeyê mirov he-



be û mirov nikaribe tê de bixebeitê û ji mecbûrî mirov here karê biyanan bike. Ew biyanêñ ku bi sedsalan xwîna bav û kalêñ me vexwarine. Çiqas zor e, çiqas bi zorê hatiye nivîsandin ev qeder.

Ji ber ci ez dibêjim qeder û qeder. Ji ber ku ev êdi bûye tiştekî ji rîzê. Mirovîñ kurd ên heftê salî, ji zarokatiya xwe û hetanî niha wiha jiyarha xwe dom kiriye. Ji wan re her tim ji layê mêtîngoran re wiha hatiye gotin: "Ev qedera we ye, ne bela me ye."

Gelo bi rastî wiha ye, gelo bi rastî ev qedera gelê kurdan e? Ev ci qedereke benamûs e?

Lê belê bersiva vê pirsê hatiye dayîn. Bersiv hatiye dayîn, lê hîn encam nehatiye standin. Koçberiya kurdan jî hîn di-dome. Wê bidome jî, heta welatê xwe rizgar bikin û cih û warêñ xwe bi desten xwe ava bikin. Wê demê, wê li nava erd û rezên xwe, zeviyêñ xwe, bax û baxçeyêñ xwe bixebeitin.

İro ji koçberiya gundiyan bajar û navçeyên welêt jî bûne wekî metropolan. Wekî Qoser, Wêranşar, Nisêbin, Bismîl, Farqîn, Siwêreg, Elih, Mêrdîn, Amed û wekî din.

Heta deh sal berê li Mêrdînê dema mirov yekî ku bi kurdi bipeyiviya bîdîta, wekî li cihekî biyan çawa mirov rastî welatiyê xwe têyi, ew qas kêfa mirov dihat ji ber ku navenda Mêrdînê hemû gelê ereb bû. Lê iro mirovîñ ereb xwe melûl dibînin û mirovîñ kurd li vê deve-re jî bi dehan tax ava kirine. Wekî bajare Sêrtê, dîsa wiha ye.

Qaço dewletê beriya Mêrdînê û beriya Heranê wê bikira avî. Lê ev bist sal zêdetir e ku ev kar didome, tiştek nehatiye guhartîn. Tenê tiştek hatiye guhartîn. Çawa gelê kurd êdi ji bo xelasîya welatê xwe li ber biyanan destê xwe venakin û hêviya xwe bi wan ve girê nadin, bi xwe rahiştine çekan ji bo ku qe-

derâa welatê xwe bi destê xwe biguherîn, ji bo kar, ji van du sê salêñ dawîn li beriyan hewl dane xwe û yek dudu bi hev re avê ji nava erdê xwe derdixin û êdi ew jî pembû û aviyam çedîkin.

Lê belê dîsa bi deh hezaran yê ciyayî û yêñ ku erdê wan tune ye bêkar dimîn. Dîsa bi hezaran bi ser riyan dikevin. Lê hinek jî li van neveran dimîn û li welatê xwe, nêzikî gundêñ xwe kar dikin. Belê... İro rojek ji rojên gulanê ye xelk li nava bax û baxçeyên xwe ne, lê gundiyan kurd baxçeyên xwe dihelin û bi stûxwarî diherin li baxçeyên biyanan, li nava erdê biyanan dixebeitin. Darê fêkiyan û rezên tiri jî bi melûlî li dûv wan hêstiran dibarşin. Çem û şikeftên ciyayî wan jî bi kulman li serê xwe didin.

Cihekî wekî gundiye Qoserê (Kızıltepe) Xursê xweşikî û şinahiya Xursê na-yê pesindan. Heft gund in ji gişa re dibêjin Xursê. Tütina ku li ber çemê wê çedîbe, li welêt bi nav deng e. Ji bilî tutîn jî fêkî, hêjîr, hinar, gûz û zerdeyên cur bi cur têrî heft welatan dikin. İro ji bilî yekî diduyan gundêñ Xursê û yêñ derdorê giş vala bûne.

Wekî gundêñ Ciayê Mazî yêñ din, wekî Şêbê ku hinaren wê li sükîn Şem-rexê (Mazidax), Dêrikê û Qoserê kêm nedibûn. Niha hinar di cihe xwe de bûne kevir

Lê hêk, mast û penîrê gundan gelo ci bi wan hat? A niha mirov li welêt behsa hêkîn gundan bike, wekî ku mirov behsa esrarê bike tê zanîn. Ku mirov dihere ji dikandar re dibêje: "Hêkîn gundan hene?" Ew wiha dibêje: "Ma gund hene ku hêkîn gundan hebin?" Ji Dêleva bacan û xiyarêñ gundan, iro bacan û zerdeyên bi hormon li sûka tiji ne. Kerengêñ ku kîloya wan ne bi pereyekî bûn, iro ji kurdan re bûye wekî müzan an kîviyan.

Belê, gelê kurd ji van taman bêpar dimîn û berê xwe didin Edeneyê. Jixwe

aniha pêşî û kelmêşen Edenevê birçine û li benda kurdan e ku herin wê derê, qene hilmek xwîna wan vexwin. Koçberen kurd jî wan pir çav lîrê nahêlin. Dîsa wa ye li kamyonan pêkdar (siwar) bûne. Dîsa waye elçî li nava taxan digerin ji bo komkirina karkeran.

Lê diravêñ (pere) ku di encamê de têkeve desten wan çiqas e?

Çiqasî qezenc dikin?

Bawer bikin hinek bi zorê diravêñ riya xwe derdixin. Çiqas pir be, têrî cil û brdilkên wan û zarokêñ wan nake. Sala çûyî mirovîñ ku çûne berhevkirina bin-deqan, rojê bi çarsed hezarî dixebeitin. Heke çar heb bûna rojê 1.600 hezar, ji bilî mafê elçî dikete desten wan. Ji bo ku diravêñ rî derxin û ji bo ku nebêjin "em destvala vegeyîyan" têr xwarinê jî na-xwin. Tenê bi nanê tîsi zikê xwe tîji dikin. Hinek ji wan jî di dawiyê de ji bo pereyêñ rî parsê jî dikin.

Di wan çadirê naylonî de radizên, nexwes dikevin, dimirin û dizewicin. Xort û keçen kurdan êdi li koçberiyê û li ser riyan hev û du nas dikin, destgirî û dizewicin. Gelek xort û qizan û bûne xwedî zarok.

Dema bêdirav dimîn û wan cihe biyan, dîsa saziyen kurdan ên ku li metrepolan in digihêjin hewara wan, carinan ku elciyê wan an jî xwediyê erdan wan dixapîne li rasta Xwedê sût û tazî dimîn. Û carinan jî dibin pêkenokên televîyônen xwînxwaran.

Gelo rojekê welatê kurdan rizgar bi-be û ew jî vegeerin gundêñ xwe, wê rewş çawa be? Ew şaristaniyêñ ku ditine û di-bînin li gundêñ xwe ava bikin, wê çawa be gelô? Ez bawer dikim wê demê her gundekî Kurdistanê, wê bibe wekî yê Ewrûpayê. Ev jî xeyalek e ez dibêjim, lê dibe ku ne pir dûr be.

ÇIYA MAZÎ

# Vegera Zap'hezaran

**D**i dîroka Kurdistan û Yewnanistana iro de 'Vegera Dehezaran' navdar û heybetdar e. Gelên gerdûn vê pirtûka 'Vegera Dehezaran' bi heyecaneke mezin dixwînin, dixwazin bixwînin û lê digerin ku vê pirtûkê peyda bikin û bixwînin. Hew çend ku hezar sal di ser re derbas bûne jî, meraqa mirovan hêj jî derbas nebûye, dixwazin fêr bibin ku li Kurdistan hingê kurdan ci anîne serê Alexandre.

Alexandre Makadon (Iskenrê de Makadonî, Iskenderê Mezin) yan jî, bi yewnanî Megas Aleksandros di 24 saliya xwe de dibê key û li ser textê bavê xwe rûdine. Ji bo ku artêsa xwe bi hêz, mezin û finanse bike, li çavkaniyê madî û madenî digere, diçe Asyayê û bi taybetî Kurdistanê ji xwe re hildibijêre ku dagir û talan bîke. Lî li Herekol û Zapê tuşî xezeb, şer û sextbûna kurdan tê. Kurd artêsa wî ya 30 hezarî û 5 hezar siwariyên wî perîsan dikan, derbeyên giran li wî dixin. Li gorî hinek zargotinan; ji artêsa wî ya 35 hezarî, bes 10 hezar leşkerên wî vegerîne, 20 hezar hatine kuştin. Ji ber vê yekê navê 'Vegera Dehezaran' li wê bûyer-cengê kirine. Ne kurd û ne jî cografya Kurdistanê ji kurdan pê ve tu kesî di nava xwe de dipejirîne. Ne kurd zor-

destî li kesî dikan û ne jî zordestiya kesî dipejirînin, ev xwezaya kurdan e.

Dema em li pelên dîrokê dimêzin, kurd û Kurdistan bi demên kin di bin dagirkeriyê de mane. Demên dagirkeriyê zêde hêkişandine; di demên dagirkeriyê de jî, dîsa serbixwe bûne û di fîrsenda yekemîn de, dagirker bi **Dijimin nema êdî wek berê dikare gelê xwe jî bixapîne, êdî wekî berê di merasimên cenazeyan de li dijî PKK'ê sloganan bide avêtin. Gelê wî êdî nalet li wî û li artêsa wî dîbarîne û súcdar dike ku ew e ji her du aliyan jî însanan dikuje, dide kuştin. Rewşenbîrên tirk feryat dikan êdî.**

derbeyên xedar ji welatên xwe dera-nîne.

Artêsa tirk a bi şan û şeref 14'ê gulanê bi hêzeke mezin, bi çekên modern û giran kete başûrê Kurdistanê û got: "Vê carê ezê PKK'ê xelas bikim." Piştî du rojan li ber devê şikeftê serbazekî tirk wiha xwe dipesi-nî: "Va em li vir in, ew li ku ne?! Lib ji wan il vir nemaye, me 2500 gerîla kuştin...!" Gelê xwe yê jar û nezan dixapand. Lî hejmara kuştiyên xwe rast diyar nedikir ji gelê xwe vedişart; rast nedigot ku gerîla bi SA-7B'yan helikopterên wan xîstine û di ya dawî de 11 kurmay ên serbaz hatine kuştin. Dema ku ARGK diyar kir ku lêxistin û xistina helikopterê

kişandine film û dê şanî raya giştî ya gerdûnê bikin, hingê neçar ma rastî pejirand ku ARGK'ê xistiye, ne ji ber arizeyeke teknîk ketiye.

Kurd ku Bz. 336'an heta niha ser ji dagirkeran re netewandine û dijimin di welatê xwe de nepejirandine, iro di vê dema sedsala bîstem a serxwebûn, azadî û aştiyê de, hîc nepejî

**Dijimin nema êdî wek berê dikare gelê xwe jî bixapîne, êdî wekî berê di merasimên cenazeyan de li dijî PKK'ê sloganan bide avêtin. Gelê wî êdî nalet li wî û li artêsa wî dîbarîne û súcdar dike ku ew e ji her du aliyan jî însanan dikuje, dide kuştin. Rewşenbîrên tirk feryat dikan êdî.**

derbeyên xedar ji welatên xwe dera-nîne.

Artêsa tirk a bi şan û şeref 14'ê gulanê bi hêzeke mezin, bi çekên modern û giran kete başûrê Kurdistanê û got: "Vê carê ezê PKK'ê xelas bikim." Piştî du rojan li ber devê şikeftê serbazekî tirk wiha xwe dipesi-nî: "Va em li vir in, ew li ku ne?! Lib ji wan il vir nemaye, me 2500 gerîla kuştin...!" Gelê xwe yê jar û nezan dixapand. Lî hejmara kuştiyên xwe rast diyar nedikir ji gelê xwe vedişart; rast nedigot ku gerîla bi SA-7B'yan helikopterên wan xîstine û di ya dawî de 11 kurmay ên serbaz hatine kuştin. Dema ku ARGK diyar kir ku lêxistin û xistina helikopterê


bo wan bidestxestina nasname û ke-sayefî ye û xwedî rûmet û welatbûn e. Ji ber vê yekê, êdî kurd bi dil û can ji bo van nirxên xwe ji bo ku dijmin bi paş ve werbigirin dicengin.

Dijimin nema êdî wek berê dikare gelê xwe jî bixapîne, êdî wekî berê di merasimên cenazeyan de li dijî PKK'ê sloganan bide avêtin. Gelê wî êdî nalet li wî û li artêsa wî dîbarîne û súcdar dike ku ew e ji her du aliyan jî însanan dikuje, dide kuştin. Rewşenbîrên tirk feryat dikan êdî. Rojnamevan Ertugrul Kürkçü di gotara xwe ya Özgür Politika de wiha dibêje: "Heta li cenazeyen şehîdên xwe jî xwedî dernakevin. Min tu caran rewşa Tirkîyeyê ew çend perîşan nedîtbû. Ew Enqere di bin dagirkiriyê de ye. Ew Enqere di bin dagirkiriyâ egoist siyasetvanan de ye. Ew Enqere iro esîr e. Heger KGB û CIA plan bikirana ku ji bo xerabkirina vî wela-tî, nikaribûn wekî van siyasetvanan encamê bistînîn." Ev dide xuyan ku êdî artêsa tirk li Başûr jî nikare bimîne, li Zapê jî nikare bimîne û li Tirkîyeyê jî cih li wê teng bûye. Gelê tirk jî êdî ji faşîzmê behdili ye, dixwaze azad bibe. Azadkirina Zapê dê bibe azadkirina Enqere û gelê tirk jî.

S. S. DILPOLO

## Kurte-nirxandinek li ser karekterê mirovahiyê

CELALETTİN YÖYLER



**G**eli xwendevanê birêz û birûmet, ez dixwazim di vê nîvisa xwe de, kurte-nirxandinekê li ser karekterê mirovahiyê bidime diyarkirin û zanîn.

Belê bi rastî mirovatî, heyîneke pir birûmet û birêz e, heke xwe binase. Lî heke xwe nenase, ji rengê mirovahiyê dûr dikeve û dibe wekî giyanwerên rawir û cenawir. Lî bi zanîna min, hêj ji wan giyanewerên bêzar û bê ponijandin ji berê berjêrtir dibe. Lewre ew bi qasî pêdiviyê xwe yên giyanewerî, erkên xwe yên tevgerî û rojanî, bi cih tînîn. Lî mirov dema ku ji rengê mirovahiyê dûr ket, pir pîs dibe û dibe berjêrtirin heyînen li ser rûyê cîhanê.

Taybetiyê mirovahiyê jî, bi nirxandinê zanîstî, du beş in. Yek: Erêni, ya din jî neyînî ye. Ango pozitîf û negatif in. Ji bîlî van, yeka sisiyan-tune ye. Ango mirov, an qenc e, an jî xerab e. Em, dikarin wan her du taybetiyen bi hinek mînakan li wir rêz bikin û binirxînin. Wekî çawa ku em, bibêjin: Merdî,

nemerdî, mîranî qelsemîrî, mirovahî, nemirovahî û qencî û xerabî. Kesên ku xewnas in, ew her bi taybetiyen erêni tên nasîn.

Wekî niha "Şex Seîd, Qazî Mihemed, Seyîd Riza, Rewşen, Bermal, İsmâîl Beşikçi," û ewen ku canê xwe yên pîroz di riya mirovahiyê de gorî kirine. A ev jî mînak ên erêni ne.

Em werin ser rewşa kesên ku di nava kesên neyînî yên nemirovahî de, digevizin. Û bîbîjin wekî niha ewen ku ji bîlî berjewendiyen xwe yên kesanî tu tiştî naponijin û li berjewendiyen gelê xwe, welatê xwe, neteweya xwe, nabin xwedî.

Wekî niha yên ku dikevine nava îxaneta gelêri, welatî û neteweyî. Îxaneta "jinikê bî mîrekî re an ya kesekî bi kesekî din re. Lî bi awayê nirxên mirovahî û gelêri, olî, îxaneta bi welat û neteweyê re, dijwîrtîn û gemartîrinê îxanetan e. Wekî îxaneta "Malbata Barzanî" ku gelek caran bi neteweya 'kurd' re hatîye kirin û hê jî tê kirin. Di dîroka cîhanê de tu kesî nedîtiye û rast lê nehatiye ku gelek gazî nijadekî biyan bike û têxe nava "Erz" û "eyalê" gelê xwe û saziyên wî yên gelêri û çandî û tenduristî. Hem jî bi sedan kesên nexweş bêçek, destgîrêdayî bikuje û bi dû ereban ve girê bide, di erdê re bikişîne. Bi zanîna min ev "malbat" ji xisletên mirovahî, neteweyî û gelêri pir dûr ketiye û bûye

dijimin û cerdevan û çeteyeke malbatî û eşîri, li dijî berjewendiyen neteweya kurd. Belê bi rastî û dîrokî, vî malbatê ji bîlî berjewendiyen xwe yên eşîri, malbatî, feodalî, tiştîkî pak nekiriye, hem jî nake, weselam. Ev mîlbat rawir û tebayîn wîsa ne, ku bi sedan pêşmergeyîn "Mam Celal" dorpêc kirin û kuştin. Hem jî ev 'malbata' dirinde û hoyen wîsa ne ku di demdirêjiyên a dîroka xwe de bi sedan rewşenbîr û siyasetmedarîn kurd ji bona berjewendiyen xwe û yên neyarêñ gelê kurd kuştine.

Weki kuştina wan siyasetmedar û şoreşvanê leheng wekî Dr. Seîd Kîrmîzîtoprak, her wîsa birêz Seîd Elçî û birekîn din ji endamîn Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistanî Iranê. Vî malbatê, Başûr bi tenê nelewitandiye, hinekî ji eşîren Bakur jî wekî Başûr, bi xwestinê wan ên nemirovahî, bûne cerdevan (caş) û çek li dijî birayen xwe yên kurd, xebitandise. Lewre eşîren Bakur wekî eşîra "Serek Çâş Tahîr Adiyaman" û eşîra Gewdan û hinekîn din di demên dirêj de hetanî niha jî girêdayî malbata Barzaniyan bûn. Hem jî wekî partiya Şex 'Şerâfettin Elçî' ew jî di rê û rîcikîn vî malbatê de dimeşin û tevdîgerin. Ez bi tundî îxaneta vî malbatê bi neteweya kurd re û tevkijiya wan a li ser kesîn bêçek, şermezâr dikim û dibêjim: Bimre nemirovahî û îxanet!

# Embaza Bêrîvan Türkmen Demirel

**M**a Embaz Bêrîvana piya, Unîversîta Marî di wendê. A wandoxê Fakulta Teknikî bi. Piyê ay Ap Heyri, wexto ke la amê bi dinya, nameyê ci Türkmen kerd bi pa. La belê na name nêşiyê weşte ay. Cokra jî, ay waştê ke emîazî cirê vajê Bêrîvan. Embaz Bêrîvan waya Embaz Cafer Demirelî bi. Min Embaz Cafer finê di finî dî bi. Nê şervanê manê delalî hetê Qoçgirî ra bî. Maya ïnan jî Tirk bî.

Embaz Cafer sûka Stanbolî di, Embaz Bêrîvan jî mabendê Kurdistana Bakur û Kurdistana Rojhilat, kişa Serhadî di şehît kewt. Ewro jî xebatanê ê embazan, piyê ïnan Ap Heyri û maya ïnan Da-yika Elif dana. İye jî zey qeçanê xo ya bi zerya germa û bi ganê zixmiya xebatê reyayinê şarê ma danê. Ewro birayê ïnano werdî, Embaz Raif jî, zereyê zîndanê Tîrkiya de no. Wexto ki ez ïnan vînena baweriya mina reyayin, gamna vera vernî şina. Min bi xorê na malbat, rûmetê şarê ma yo. Çimki na malbat kok ra biyo tewrdê lecê şoreşê ma. Gerek ma ney bizaranê. Wa nê malbatê wina-yinî çimandê ma verdi vinî nêbê ke, dîrok raşt bêro virazyayin. Na kiştra jî karo gird, kewno mi-landê roşnikaran dê ma ser.

Sera-neway û jewin di ma wandoxê we-latperweran waştê ke Unîversîte Marmarî di jeno-sidê Halepcî lahnet kerê. Roja 15ê Adarî, ma wandoxê Kurdî kom viraşt ke şewra rew ma bêrê kampûsê Göztepî. Bî şewra ez şiya ki, bê Embaza Bêrîvanî mara kes nêamebi kampûsî. Min jî, xo bi xorê vatê ke ez berey menda. Bi raştî jî ez berey mendbiya. Ez sist sist kewta zeredê kantînî, min wewna çosmedê xo ke bê Embaza Bêrîvanî kes çiniyo. A roj ez winî şermaya ke, qet xo vîra nêkena. Min hewna kerdê çiye bivatê ke, ay ridê xo tirş kerd û mirê wina vat bi: "No senî karo ke kes goş nêdano pê. Kotî mend şoreşîya ma. Bi na hala veradi şoreşî, mayê nêşê xo rê wêr bivijîyê.

Qewlê ma wina nêbî. Gorê vatişî, gerek ma heme şewra rew tîyadbi-yayê. Şewra bîro çîno ke giran bivi-jîyo vernînda ma, o çax mayê sekerê. Embaz ewna nêbeno. A nika mi fahm kerd ke, xebatê mayo ve-riyin kok ra venga." Sifteyin mi ayrıre vat: "Embaz tiya xo ver de kisey ke-na. ûslûbê xo tayn nermki, ke ma pêra çiye fahm bikerê." Wexto ke min wiñi vat, Embaz Bêrîvan tayna kahriya mira, awiranê xo jî fina tirş kerd û wina vat: "Nika tiyê se vanê embaz. Na babeta mayê nêşê bibê şîwane jî. Heme çînde bawerî û girêdayin esto. Zahmetê na ray vêsiyo. Keso ke na zahmet nêşo bi-do çimandê xo ver, oyo sereyê xo biceno siyanê wişk ra. O wext merdim se vajo jî berey maneno. Ewro mayê pêrodê ke şewra karanê xo de şenik nêkewê." Mi wewna ke Embaza vera peyd ra ling nêçekena. Mi çend ke çewt kisey kerdê a ameyê mi ser. No fin ez kahriyaya ay, û mi cirê wina vat bi: "Tiya xo ver de kisey kena. Hukmê hîre mengî noyo. La belê ez û tiya bi serana nê çî miyandê. Gamekna embazê bêrê. Tiya qandê çîçi hîndi qîrena mi." Wexto ki mi ci-re winî vat, Embaz Bêrîvan tayn sist bî. Bahdo jî, şî di çay erîna û ard. Hewna ke ma çay şîmitê, ay minrê wina vat bi: "Embaz ma çayê xo bisimê, bahdo jî pêrodê. Ez tora, tiyê mira fêşî xîntê. La belê ewtiya de nêbeno, ma şirê cayo ke çimandê şariya dûrî, ma weş pêrodê."

Bahdoyê çay, ma kursîra werîşti û şiyê bindê daran, faşî sero de ronişti. A roj vera dihîrî embazê mayêrî bînî jew bi jew ameyê kampûsî. Hin-



do ki yeno mi vîrî, a roj Embaz Bêrîvan bê min, nêkahriyê kesî ra.

Serna Embaz Bêrîvan û mîrdê ay Embaz Hesen piya kewtê binçim û nezdiyê pancês rojî, ïnan piya Gayrettepe de tahdeyê dijminî diyê. E rojan de ma vêşî pê nêdiyê. Bahdo ez pey hesiya-ya ke hûrdna embazî jî şiyê teber û biyê tewrdê gerîlanê arteşa reyayina şarê Kurdistanî. Embaz Bêrîvan, serê tepya wazena ke embazanê xo ya piya ravrê Kurdistana Bakur. A roj, sînor de mabendê gerîlanan û eskerandê Tîr de lec vejyeno û wija de şehîd kewna. Embaz Cafer Stanbolî de, Embaza Bêrîvan jî Serhade benê şerZ

ZÜLKÜF KİŞANAK

## Ji bo temâşevanê MED-TV'ye Ankete

### Cihê ku hûn lê rûdinin

- Karê we**
- Karker
  - Karmend
  - Esnaf
  - Xwendekar
  - Cotkar
  - Serbest

### Zimanê we yê zikmaki

#### Hûn kîjan zaravayen kurdî dizanîn?

#### MED-TV ci tîne bîra we?

#### Hûn ji kengê ve li MED-TV temâse dikin?

- 2 sal
- salek
- 2-3 meh

Wekî tê zanîn televîzyona kurdî, MED-TV'ye 2 saliya xwe qedand û kete sê saliya xwe. Di gel hemû astengiyê dagirkeran, ev televîzyona ku wekî "Televîzyona gelê bêdewlet" tê binavkirin, weşana xwe didomîne. Em dixwazin bi vê anketê bizanîn ku gelê me, bi ci çavî li televîzyonê di-nêre û weşanên wê çawa dinirxîne. Em ji hemû xwendevanê xwe dix-wazin ku vê anketê dagirin û ji me re bişinîn. Emê pişti ku encam gîhiştin destê me, bersivîn we binirxînin û di rojnameyê de biweşînin.

#### Hûn li ku li MED-TV'ye temâse dikin?

- Li mal
- Li cîhekî din

#### Hûn her roj li MED-TV temâse dikin?

- Erê
- Na

#### Li mala we cend kes li televîzyona kurdî temâse dikin?

- 1) .....
- 2) .....
- 3) .....
- 4) .....
- 5) .....
- 6) .....

#### Hûn zimanê kîjan bernameyan hîsan û baş dibînîn?

- Hîsan e
- Giran e
- Jê fêm nakim

#### ☐ Baş e

#### ☐ Bi dîtina we bernameyan li ser kîjan mijaran pêwist in?

#### ☐ Ji ber MED-TV'ye we tu tade dîniye?

#### ☐ Rola MED-TV'ye di pêkanîna vekiliya neteweyî û careseriya pirsgirêka kurdî de ci ye?

#### ☐ Li gorf we pirsgirêka kurdî cawa careser dibe?

#### ☐ Hûn ji bilî MED-TV li kîjan kanalan temâse dikin?

#### ☐ Hûn kîjan wesanan dixwinîn?



- **15.06.1909:** Rojnameya Peymanê dest bi weşanê kir
- **15.06.1947:** Mele Mistefa Barzanî, tevî 500 kesî derbasî Sovyetê bû.
- **16.06.1994:** DEP (Partiya Demokrasiye) hate girtin.
- **17.06.1995:** Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ji ber pirtûka bi navê 'Ji ramanê re azadî (Düşünçeye özgürlük)' doz li 99 rewşenbîr û xwediyê weşanxaneyê vekir.
- **19.06.1950:** Sokratesê kurd, Hozan Pîremerd çû ser dilovaniya xwe.

- **19.06.1991:** Ji Komîteya Navendî ya PKK'ê Ahmet Güler (Mahir) di şerê li Selim-Goran de jiyana xwe da der.
- **21.06.1955:** Mazlum Doğan hate dinê.
- **21.06.1991:** Rêvebirê HEP û Serokê DEP'a Batmanê Sıddık Tan ji hêla kontrayan ve hate kuştin.
- **20.06.1918:** Kovara "Jîn" li Stenbolê dest bi weşanê kir. Kovar bi piştgiriya 'Komeleya Pêşketina Kurdistanê' hatiye weşandîn. Berpirs û xwediyê kovarê Hemzeyê Muksî bû. Kovara ku 25 hejmar derket bi 4 zaravayê kurdî weşana xwe dikir.

## AWIR

# Bi çavêner amerîkiyan Şerê IRA'yê

**Her wiha senaryoya  
filmê dawî 'Dijminê  
Bêdeng' jî bi vî rengî  
ye. Ev film jî, ji hinek  
aliyan ve filmê  
Rambo tîne bîra  
mirov. Di vî filmî de  
jî dîsa qehremanê  
"Esra bîstan" ên  
amerîkayî xwe wekî  
fêriştîyan didin  
nişan, lê yên li dijî  
xwe jî bi terorîstîyê  
sûcdar dikan.**



**L**i ser tevgera azadiya IRA'yê di demêna dawî de gelek film têna kışandin. Mixabin filmê ku têna çêkirin jî, ji aliye derhênerên Amerîkayê ve têna amadekirin, lewre jî li gorî raman û berjewendiyê wî welatî, li ser bûyeran radiwestin. Her wiha senaryoya filmê dawî 'Dijminê Bêdeng' jî bi vî rengî ye. Ev film jî, ji hinek aliyan ve filmê Rambo tîne bîra mirov. Di vî filmî de jî dîsa qehremanê "esre bîstan" ên amerîkayî xwe wekî fêriştîyan didin nişan, lê yên li dijî xwe jî bi terorîstîyê sûcdar dikan.

Di serê film de kontrgerillayê Ingîlistanê bi ser malekê de digirin û mirovêkî İrlandî dikujin. Ji wan kirî ku mirovê ku kuştine mîlîtanê IRA'yê ye, lê xuya kir mirovê ku kuştine masigirekî İrlandî ye.

Di vî filmî de kurê wî masigirî mezin dibe û di nav tevgera azadiyê de cih digire. Gelek livbaziye bi deng dike, her çiqas leşker û serwîsa veşarî ya Ingîlistanê dixwaze ku wî bidest bixe jî bi ser nakeve. Lîstikvan Brad Pitt, di film de bi navê Frankî cih digire, di rola lawê masigir de ye.

Rojekî mîlîtanê IRA'yê tevî Frankî wê livbaziyekekî bikin, lê serwîsa veşarî ya Ingîlistanê pê dihese û derdorêñ cihê ku livbazi wê lê bê kirin digire. Li benda derketina mîlîtanê İrlandî dissekinin, cawa ku Frankî fermana destpêkirina livbaziye dide, artêşa Ingîlistanê jî hemû tanq, helikopter û hwd dide dişixulandin. Di vê bûyerê de Frankî di-

gel hevâlekî xwe sax difilitin, çar mîltanê İrlandî û gelek leşkerên Ingîlistanî dimirin.

Piştî vê bûyerê Frankî diçe Amerîkayê ku stîngeran bistîne. Bi navberiya dozgerekî li Amerîkayê li mala polisekî, Harrison Ford ku di film de navê wî Tom e. Haya Tom ji nasnameya Frankî nîn e. Frankî xwe bi navê Roy, wekî karkerekî inşaatê dide nasîn.

Her wiha ew dozgerê amerîkî tekiliya Frankî û qaçaxçiyê çeka bi hev re çedike. Ji bo sitandina stîngeran her tiş hal dibe, ew roj tê ku Frankî here stîngeran bistîne û here İrlandayê, lê xeberrek jê re tê ku wê hatina pereyan bi derengiyê bikeve. Li ser vê yekê serê Frankî bi çeteyê re dikeve belayê.


Di wê navberê de Tom jî pê dihese ku Frankî ji İrlandayê hatiye da ku stîngeran bistîne. Tom li berî Frankî dibe asteng, naxwaze ku wan stîngeran bistîne û bibe İrlandayê. Frankî li ber xwe dide. Rastiya welatê xwe û cudahiya di navbera welatê wî de dibêje. Di dawiyê de Frankî xwe ji destê Tom derdixê û diçe ku stîngeran bistîne, hemû endamîn çeteyê dikuje û radije stîngeran.

Frankî ber bi şeveqê stîngera li keştiyan bar dike ku here. Lî polisê Amerîkan Tom, dîsa digihîje Frankî û li ser keştiyê bi hev dikevin. Cara dawî her du hev û dû birîndar dikan, her wiha wekî her carêñ din qehremanê "esre bîstan" yê amerîkî serkeftî derdikeve û berê keştiyê dide Amerîkayê.

AZAD ALTUN

## ÇAVDÊRÎ

MIRHEM YİCİT



## Di çend xalan de rewşa Başûr

**E**v çend hêste ne ku rewşa başûrê welêt careke din di nav siyasi û rewşenbîren kurdan de bûye dabaşa serekî û yekemîn. Sebeb hevkariya malbata Barzanî û PDK'ê yê bi dagirkirêñ tirk re ye. Hevkariyeke ku gelek ên welatparêz, hêrs û bêhnteng kiriye. Em jî, iro me dil heye di çend xalan de rewşa Başûr binirxînin û hinekî herin destpêka şoreşa rezberê û ber bi iro ve bê:

1- Di destpêka salên 60' de şoreşa 11 rezberê ne bi tenê ji bo başûrê Kurdistanê, belê ji bo giş perçeyen mayî jî hêviyek bû. Niha dibe bar û derd. Hem ji bo xwe û hem jî ji bo perçeyen din.

2- Başûr hem ji bo hundir û nav xwe û hem jî ji bo derve dibe tecrûbeyeke xerab û dibe nimûneya ji bo kesen ku diwxazin kurdan mîna xelkekî balixnebûy û lipaşmayî ku nikare bîbe dewlet û mafê çarenûsê heq nekiye nişan bidin.

3- Li Başûr îrade û insiyatîfa kurdan ji destê wan derketiye, di destê hêzên derve de ye. Kurd mane benikê dû hebana. Bûne maşik û pêlîsk di çavê xelkê de.

4- Fersend û derfetên dikevin desten kurdan kurd nizanîn û nikarin bikar binin û giş yeko yeko ji dest diçin. Ji bo vê yekê jî divê berî ku kurd gazin û giliyan li der û çûranan bikin, divê ewil gazina wan ji xwe be. Xayıntiya navxwe sebeba serekî ye.

5- Li Başûr gava ku mirov li navan dinere modern in. Wek Partî Demokratî Kurdistan, Yekîtiya Niştimanê Kurdistan. Belê naverok û kar kevn in. Nav û naverok hev û dû nagirin. Têkiliya wan bi hev re tune.

6- Problema stratejiya siyasi, siyaset û serokayetiye heye û bi gişî kultura birêveriyê, kultura siyasi, neteweyî û idarî li pey zemîn e, bersiva demê nade. Li cihê ku lê siyaseten modern û neteweyî tune be kultura hemdem û neteweyî jî çenabe.

7- Pratîka ewqas sal, salên paş 1961'ê derdixe ku merkezibûyîn û sentralizebûyîn çenebûye. Ne merkezek çend merkez, ne otorîteyek, çend otorîte, ne gumrukek çend gumruk, ne artêsek çend artêş, ne polîsek çend polîs, ne dadgeh û brokrasiyek belê hejmarek dadgeh û brokrasi û dawîne hikûmetek çend hikûmet hene. Ev jî enerjî û karîna neteweyî dikuje, heder dike û dibe sebeba problemen kronik, daîmî û heta heta û trajediyeke li pey ya din.

8- Şerîn li Başûr di nav hêzên vî perçeyî de çebûne ji şerîn nav demokrat û anti-demokratian, neteweyî û neneteweyîyan zêdetir, şerî nav desthelatdariyê herêmî, emaretwazî, nevçegêrî û mîlbatparêziye ne. Ji vê awirê ve, ev şer paşverûne, xerab in û bi tenê kaosê, tevliheviyê çedîkin, zirar in. Her ji ber vê jî ev zêdeyi 30 salî ye ku li Başûr şer heye, belê negîhiştiye çu der û cihî.

9- Demokrasî û hevgiriya navxweyi li Başûr çenebûye. Serokatiyê Başûr û berî gişan jî serokatiya PDK'ê ji hesabdayîna gel û besdariya gel a nav siyasete ditirse, hesaban dike. Bi tenê dema qûş li wan teng dibe, xelk tê bîra wan.

10- Problemeke din jî ev e li Başûr: Li vir pratîk û serpêhatî, bûyer û qewimandin teorefîze nabin. Nabin belge û wesiye û nabin şano, roman, analîz û hwd. Ev jî faktora bingehîn e ku çîma hafize û bîreke neteweyî çenabe û çîma trajedi ducar dibin.

11- Ü dawî giş sal, bûyer û serpêhatîyê heta. iro îspat dikan ku êdî serokê Başûr divê bîn guhartin, bîn avêtin. Ya din ev ji xuya ye ku divê zemîn û birêveberiya siyasi li vî parçeyê welat hem bête Kurdistanîtirkirin û hem jî firehtirkirin. Bi gotinin din berpirsiya parçeyî û klasik barê şoreşê li Başûr nikare hilgire. Hem bi xwe di bin vî barî de dike û hem bi xwe re jî ne carekê belê hejmarek car xelkê me jî li vir bi dev re bîriye erdê. Ü hê rastir çare û derman Pekekeyîbûna vî parçeyî ye jî.



**M**e xwest ku dema kasete we derket bi we re hevpeyvînekê bikin, lê ji ber hin mercen ne asayî çebub. Beri pêşin ez dixwazim ji we hîn bîhim ku kîjan ji we di nav komê de ci karî dike?

**Süleyman:** Gava ez endamên Koma Amed bidim nasa, wê derkeve holê ku kî ci karî dike. Koma Amed di sala 1988' an de ava bû û di sala 1993' yan de ji di bin banê NÇM'ê de dest bi xebata xwe kir. Heta iro me 3 kaset derxistine. Iro du kesen ji Koma Amed; Serhed û Memo li Ewrûpayê di Akademiya Kurdi de xebatê dikin. Yen li vir ji di NÇM'ê de xebatê dikin. Vê gavê kesen li Tirkîyeyê di nav wan de kesê ku li amûrên muzikê bixe tune, ez solist im, Serab solist e, Ahmed li NÇM'ê naxebite û ew ji solist e, Fikri ji di konseran de akordiyonê lêdixe, bi piranî karê berhevkirin û sazKirina stranan dike. Ji bili van du kesen nû tev li komê bûn. Hevalê Mustafa li gitarê dixe û vokalist e, Hevalê Turan li NÇM'ê dixe bîte, li tenbûre dixe û ji komê nîn e.

Ew ji Koma Amed e û nîn e ji. Ji ber ku hê ew besdarî komê nebûye, lê di komê de li tenbûre dixe. Pişti wî Hevalê Ergin hem li Ewrûpayê hem ji li vir alîkariya me dike û li Bas-Gitarê dixe. Ew di xebatan de heye lê tevli komê nîn e. Ev mijareke tevlihev e.

*Ergin tirk e?*

**Serab:** Belê Mustafa ji Gurcî ye.

*We sê kaset çekirin her sê ji ji hev cihe ne, ji ber ci?*

**Süleyman:** Di rastiya xwe de ji hev ew qas ne cihe ne. Ji aliye qaliteya muzi-

kê ve û ji aliye tekniki ve cihê ne. Kasetta yekemîn di nav mercen pir dijwar de hate çekirin, kemasiyen tekniki hene, mesela hevalê me Melek pir vokaleki bas bû, lê kaset di şerten pir dijwar de hate dagirtin. Ji ber wê xetayen tekniki hene. Di wê demê de rewşa me ya aborî ne baş bû.

Di vê kasete de şert edî bastır bûn. İcar endamên komê ne li vir bûn û em dema di studyoyê de bûn, kaset qut bû me ji sedî 70'yi kaset ji nû ve tomar kir. Tişte ku me di kaseten din de nekiribûn me di vê kasete de pêk anîn. Stranen gelêri yen ku me berhev kirine û saz kirine me tev hev bi awayekî zindi gotin. Berê imkanen studyoyê tunebûn, lê icar me

**L**i gorî min hunermend pir li paş mane. Şoreş pir di pêş de ye, hunermend û huner di riya ku şoreşa kurdi vekiriye re derketine ser qada jiyanê. Belki pirên wan hê ji li pişta şoreşê bar in. Li dinyayê di nav gelên bindest de hunermend riya şoreşê vedike. Li vir şoreşê riya hunermendan vekiriye û bi destê wan digire.

pir derfet bi dest xistin û em ji kemasian rizgar bûn. Ancax her sê kaseten me ji hev ne cudatir in. Lâ ji aliye tekniki ve li gorî min cudatî hene.

*We sê kaset çekirin, hûn zêdetir dixwazin muzika gelêri bistirên an besteyen xwe bibêjin û hûn bi ser ketin?*

**Fikri:** Kom dixwaze muzikeke sentez çebike. Ji motifen muzika gelêri ya kurdi sud wergire, bi amûrên rojavayı, bi şeweyeke nû, muzikeke nû çebikin. Em çiqas serkeftin e, di dawiyê de wê gel biryare bide. Di kaseten me yê berê de

# Şoresê riya mu

beste ji hene, di vê kasete de stranen gelêri yen ku gel dizane û hê neketine tu kasetan, me ew xistin kasete xwe. Me hinek ji wan bi melodiyan ve dewlemend kir, hinekan ji me deng bi motifen raq, pop û stranen gelêri dewlemend kir. Di kasete me ya sêyemîn de tişte ku me xwest, me çekir. Emê di rojêne pêş de kasete ji besteyan pêkhati ji çebikin.

*Cîma stranen ku we berhev kirine bi piranî ji Serhedê ne?*

**Fikri:** Ez wiha rave-bikim, yanê me girîngî da vî tişti ku em stranen gelêri ji nû ve saz bikin û pêşkêsi gel bikin. Di vê kasete me de giraniya muzika Anatoliya Navîn heye. Ji ber ku wê demê hin hevalen me yen di komê de ji Serhedê bûn û stranen ku wan anîbûn me ew nirxandin. Endamê komê Ahmet çend stran anîn, me ew girtin kasete û du heb ji ji Culemîrge ne û van di tu kasetan de cih negirtine.

*Dema ku we stran saz kirin, we di stranen de guherin çekirin?*

**Fikri:** Me tu cari deformé nekir. Me hin melodî li ser zede kirin, weki strana 'Amediye' parçeyeke pir sade bû. Me gotin neguhartin, lê awazeke weki

Amediye kêfxweş e

(Gozelê gozelê...)

(Heeeey) Amediye kêfxweş e  
lê zede kir.

*Baş e hûn wisa dibêjin lê di strana 'Haynik na' de bi qasî ku ez dizanim we guherin çekiriyê ji ber ci?*

**Fikri:** Niha ez wiha bêjim, me hin stran eyîn gotin û versiyonên wan ên cihê cihê hene. Yanê gottenen hin stranen dibe ku weki hev bin û versiyonên wan cihê hebin. Lâ du stran hebûn me herdu bi ser hev ve danîn û stranen bi wî ren-gî çekir.

*Ji ber ci we tiştekî wisa kir?*

**L**i gorî min hunermend pir li paş mane. Şoreş pir di pêş de ye, hunermend û huner di riya ku şoreşa kurdi vekiriye re derketine ser qada jiyanê. Belki pirên wan hê ji li pişta şoreşê bar in. Li dinyayê di nav gelên bindest de hunermend riya şoreşê vedike. Li vir şoreşê riya hunermendan vekiriye û bi destê wan digire.

**Fikri:** Ji bo dewlemendbûna wê, me wisa kir. Me di bingeha motifan de guherin çenekir û me eslê her du stranen ji xera nekir, di vir de li gorî min tu xeleti nîn e.

**Süleyman:** Jixwe nakaratê wan eyîne, lê peyvîn ku tê de ne cihê ne nakarta herduyan ji eyîn ye. Pişti ku kaset derket hin insanan ji ji me re gotin 'Hûn ve stranen hin lezgîn distirên' û amûrên ku hatine bikaranîn hineki stranen sert kirin e. Tişte ku di vir de tê gotin hineki bi espirî ye, lê me hineki haşin gotiye.

*Di kasete we de stranen zazakî ji tune ev ji ber ci bû gelo?*

**Serab:** Ji ber ku li Dêrsimê şansê me yê ku bi devoka zazakî ya wê derê stran berhevkirin nîn bû. Sedema besdar bûna min a komê ji bo ku têkiliyê bi der dorê Dêrsimê re deynim û vê kemasiyê bi awayekî ji holê rakim wê di rojêne pêş de ev kemasîji ji holê rabe.

**Fikri:** Beri ku kast derkeve em ji li ser vê mijarê axivîn.

**Süleyman:** Di kaseten me yêne pêşin de du parçeyen soranî hebûn. Di kasete yekemîn de yek di kasete duyemîn de ji yek û di kasete duyemîn de stranen zazakî ji heye. Yanê di muzika kû em çedîkin de em dixwazin muzikê bigihînin asta netewebûn, divê ev sexte nebe, divê em ji dil bin. Yanê kasetekê çedîkin, kurd lê guhda dikin kurdan ku bi kirmancî (kirdki) diaxîvin, kurdan ku bi soranî diaxîvin hene, xitabî herkesi dike, divê mirov van stranen baş dahûrîne, gava mirov baş pê nizanibe, baş bi hesten wan stranen nizanibe, mirov wan nava bixe kasete ji bo ku hinek din ji kaset zede birfose, ev ne baş e, ev ne rast e. Em li ser vê pir rawestiyan di rastiyê de ev yek bi mirov pir tiştan dide windakirin.

**Fikri:** Parçeyen ku me xistine vê kasete em belki ji salekê zedetir li ser xebittin. Beri wê ji em hinekî li ser xebitbûn, hema hema salekê, sal û nîvekî me xebat kir. Yanê sîrf ji bo ku stranen kirdikî û soranî bikeve kasete, bi lezgîni mirov li ser xebatekî neke û stranen baş nizanibe bixe kasete ji ne baş e.

**Süleyman:** Divê ez hest û ramanen kesekî basûrê Kurdistanê bizanibim, divê hestê kesekî ji Dêrsimê bizanibim an ji ji wî insanî hin tiştan wergirim, berpîsiyeke min a wiha heye. Ev kemasîyeke girîng e. Muzîsyenekî kurd van zaravayen kurdi nizanibe, kemasîyeke girîng e. Ev giş ji bo me kemasîne, sibê ez li Silêmaniye konserekî bidim an ji bi kesekî ji wir re biaxivim, hesten kesekî Helepciyî yan ji Silêmani divê bikaribim bidim. Heta çima bi goranî stranen be? Ev kemasîya hemû muzîsyenê kurd e, divê em vê kemasîyeji holê rabikin. Heke em qala stranen gelêri bikin, ev pêva joya ku demeke em dijîn me ragihand.

Ez li Agiriyê hatime dinê, ez li wir mezin bûme, jiyame tiştê ku ez jiyame min xiste nav berhemâna xwe. İro tiştekî din e, ez iro li Agiriyê najîm, ez iro hîn zede botiyan dibînim, dêrsimîyan dibînim, ji ber vê em divê di berhemîne rae yen ku emê çebikin de vê kemasîyeke telafî bikin.

Heke em bixwazin bigehijine asteke neteweyî, divê di stranen xwe de di zimanen xwe de û devokên xwe de em serkefî bin.

*Gelo ev tê wê maneyê ku di rojêne pêş de kesekî bi soranî dizane, hûnê bixin nava komê?*

# Çıroka Kurdî vekir

**Süleyman:** Na na tiştê ku min got ne ev e. Mesela me strana 'Baran baranê' got, ew stran di wê demê de hevalê me yê di komê de berhev kiribû. Lewre me hesta wê stranê fêm dikir. Di destê me de pir stranê soranî hebûn, lê ji ber ku me ji 'Baran Baranê' fêm dikir, me ew xiste kasetâ xwe. Tiştê ku ez qala wê dikim ev e. Ev nayê wê wateyê ku divê em ji bo stranê soranî an kirmancî kesekî bigirin nava komê. Ancax însanên li ser wê xakê dijîn, divê mirov ji wan fêm bike. Ev nayê wê wateyê ku pêwistiya hînbûna wî zaravayê kurdî nîn e, bêrevajî vê yekê, divê em ji bo hînbûna zaravayê din ên kurdî hewl bidin xwe.

*Hûn dikarin li ser bikaranîna amûrên rojavayî di muzîka kurdî ya gelêri de ji me re ci bibêjin.*

**Fikri:** Em muzikeke sentez çedikin, niha çêkirina muzikeke bi vî rengî di eyîn wextê de navneteweyîbûnê, bi xwe re tîne. Bikaranîna amûrên gelêri di muzîka kurdî ya gelêri de bi xwe re neteweyîbûnê nayne. Yanê hûnê xwe çawa bi kesekî Ukraynayî bidin fêmkirin. Lewre ji me re dibêjin ev 'tirse' ev ji tirsê derketiye, ev estrûmanen navneteweyî ne, ji ber vê yekê muzîka kurdî ji ji bo ku di nav muzîka gelên din de cihê ku heq kîniye bigire, ev tişt pêwist e.

**Süleyman:** İro em li gerî'ayêndi kurd dînihîrin, çeka herî pêşketi bi kar tînin. Ev ji ber pêwistbûnê ye. Ez û Mustafa di eyîn komê de ne, Mustafa gitarê lêdixe, ew xwe bi wê ifade dike. Belkî bi tembûrê ji xwe bikaribe ifade bike, lê ew bi gitarê zêdetir xwe ifade dike. Mustafa belkî bi qasî mirovekî ispanî wê hîs dike û ez ji kesekî ku ji gundekî Agiriyê hatime me, divê hestêne wekî hev bin yanî xwezayî bin.

*Çiroka stranê ku we berhev kirine, hene?*

**Fikri:** Çiroka pirê wan hene. Mese-la çiroka strana 'Hoy Memo' heye. Memo di dema Şerî Yekemîn ê Cîhanê de çûye leşkeriyê bi salan nehatiye, rojekî diya wî dînihîre ji odaya bûka wê deng tê, wisa fêm dike ku bûka wê bi yekî din re ye....

**Serab:** Yavuz Bingöl ji ji bo strana xwe ya bi navê 'Kirmizi Gü'l' heman çîrokê dibêje, lê ev bi iñtimalake mezîn derew e.

**Mustafa:** Li her derê dinê tiştê bi vî rengî hene. Mirov çûye şerî Koreyê hatiye jîna wî bi yekî din re zewiciye, yanê pêncî cureyîn wê hene. Ev li nav lazan, çerkezan, kurdan, tîrkan de hene.

*Çiroka strana Zerdê ji heye gelo?*

**Süleyman:** Hema hema di her stranê de tiştîki wiha heye. Di nav strana 'Zerdê' de mesajeke taybet heye. "Hoy hoy Memo" hîn zêde tê zanîn. Yê din ji ancax bi lêkolinan mirov dikare derxe hole.

**Serab:** Divê gotin ku gelek stranê

ku çiroka wan heye û ji aliye komê ve hatine berhevkinin ji neketin kasetê.

*Di tevgera azadiyê de cihê stranan ciye?*

**Serab:** Di tevgera azadiyê de cihê her ferdeki ci be, cihê stranê ji ew e. Her gava ku ew ferd diavêje, têkiliya ku datîne,

na van rast nabînin. Stranê gelêri nirxênu kurdan sed û sed-pêncî sal berê afîrandine. Pêşkêşkirina wan têkoşîneke pir mezin e. Divê li vê mijarê bi awayekî pir cidi bê nihertin. Girîngiya besteyan ji pir mezin e, her wekî çawa ku dengê deng-bêjekî welatê wî tîne bîra mirov, beste ji riya parastina wê axê û riya azadkirina wê vedibêje.

**Süleyman:** Marş ji beste ne. Kurd di şer de ne, malen wan têne şewitandin, berxwedana kurdan heye, kurd têne tunekirin. Pir tişt hene ku li ser jiyanâ kurdan dan divê bîn gotin. Bi awayê lorîkan hûn şoreşê nikarin bînîn zîmîn, heke hûn bixwazin ev tiştîkî tûj be, divê wekî marş bê gotin.

*Di vê maneyê de muzîka kurdî di kîjan merhaleye de ye?*

**Serab:** Kurd di kîjan merhaleye de bin, muzîka kurdî ji di wê merhaleye de ye. Raste rast wisa nîn e belkî, ji ber ku kurd bi sedan sal in bindest in, têne perçiqandîn hinek tecrübe qezenc kirine û vê tecrübeyê riya têkoşînê hîn wan kiriye. Hunermendê vî gelî hê nû ne, nû di afîrin û diafîrinin. Di vê maneyê de bi têkoşînê re di eyîn astê de çayîn nîn e. Feqet we got ku di stranê gelêri de amûrên rojavayî ji nûbûna kurd, nûbûna her tiştî ye. Kurd her li dînyayê belav dibin muzîka kurdî ji li dînyayê belav dibe, çand ji wisa ye. Mesela hûn bi nanekî tîsi bi



armanca ku datîne ber xwe ci be, cihê stranê ji ew e. Çand û huner ji divê wekî ku çawa şervanekî azadiyê 24 saetan ji bo gelê xwe şer dike, an ji dayikeke kurd çawa li axa xwe xwedî derdikeye, kesê ku bibêje ez hunermend im ji divê bi cîdiyeteke wiha li hunera xwe xwedî derkeve û bi vî rengî xebata xwe bidomîne. Her wekî ku tê gotin 'Kesênu ku stranê geleki çedikin, ji kesen ku qanûnan derdixin xurtir in.' Di guherîna mirovan de

*Li gorî gotinê we iro ev té kîrin?*

**Mustafa:** Kesê ku muzîka gelêri çebike divê ji nav gel be. Muzîka gelêri rastiya di nav gel de tîne zîmîn. Tiştê ku iro ji nav gel bê çêkirin belkî beste be, lê di nav qonaxa demê de ew ji dikare bibe muzîka gelêri. Ji ber vê yekê mirov nikare iro stranê gelêri û besteyan derxe hemberî hev.

**Fikri:** Evi şiroveyeke pir baş bû, ji ber

**H**er gava ku ew ferd diavêje, têkiliya ku datîne, armanca ku datîne ber xwe ci be, cihê stranê ji ew e. Çand û huner ji divê wekî ku çawa şervanekî azadiyê 24 saetan ji bo gelê xwe şer dike, an ji dayikeke kurd çawa li axa xwe xwedî derdikeye, kesê ku bibêje ez hunermend im ji divê bi cîdiyeteke wiha li hunera xwe xwedî derkeve û bi vî rengî xebata xwe bidomîne.

cihekî hunerê yê taybet heye. Berî her tiştî kurdêni bi rastiya xwe hesiyan e, bi strana xwe hesiyan e, rastiya xwe dîstîne. Hûn bi rojan propagandeyê, belkî tiştî nekeve serê yekî, lê gava hûn stranekî bistîrê û bibêjin 'ev strana axa te ye' ew ji wê baştîr fêm dike. Belkî di têkoşîna hemû gelan de hunermend û stran riya gel vedikin, lê ji bo kurdan cihê stranê hîn cihekî ye.

*Li gorî we stranê gelêri zêde li ser gel tesîr dikin, an beste?*

**Serab:** Em wekî muzisyen cudakirin-

dar û cowan dikarin şer bikin. Lî hûn ku di şertîn dijwar de navendeke çandê ava bikin, belkî hûn nikarîbin asta ku hûn dixwazin bigîhîjinê. Ji ber vê yekê di şertîn jiyanê de rewşa şer ji divê li ber çav bê girtin. Di vê rewşê de di nav çand û hûnera kurdî de dîsa ya herî pêşketi muzîka kurdî ye.

*Hûn dikarin bibêjin em bi ser ketine, an ji muzîka kurdî li vir çiqas bi ser ketiye?*


**Fikri:** Pivan ci ye? yanê heke pivan a şoreşê be ev pêşketina şoreşê be şoreşê xwe bi gel û raya giştî ya cihanê daye pejîrandin, huner pê re hevcot naçe.

**Süleyman:** Li gorî min hunermend pir li paş mane. Şoreş pir li pêş e, hunermend û huner di riya ku şoreşâ kurdî ve kiriye re derketine ser qada jiyanê. Belkî pîren wan hê ji li pişta şoreşê bar in. Li dînyayê di nav gelên bindest de hunermend riya şoreşê vedike. Li vir şoreşê riya hunermandan vekiriye û bi destê wan digire.

Ev 8 salên dawî ne ku di warê muzîka kurdî de hin gav hatine avetiñ. Hin saziyîn çandî û hunerî weki NCM, Ake-demiya Kurdî derketin holê. Berê tevli-heviyek hebû. Muzisyenê kurd ji di pir waran de xeletî û derew dikirin.

**HEVPEYVÎN: M. AKSOY  
WÊ BİDOME**

# Şevbihêrka Hestên şevê



Hêviyên min wekî serê çiyayên Zagrosan pir bi dûman in. İro tu wekî berfineke keleş li qûntarêni çiyan, pejna te li ber çavêr min e. Neke tu berfi, neke berf tu bi xwe yî. Li ser pelgân te dilopên avê bi tîrêjîn rojê yên şeveqê li dora xwe mîna elmasrengan belav dibin.

**E**v dûriya ji welat bûye wekî rîşike bêderman di canê min de. Ew xaniyên me yên ji herî û keviran hatibûn avakirin iro ji her rojê bêtir lewna wan li ber çavêr min dihere û tê.

İro her rêsivaneke ku ez berê tê de meşiyabûm, lê belê min xweşikîya wê nedîtibû, iro ez hîna nû wê dinasim ku ew rêsivana rêçika min bûye.

Di werza payizê de dema nû baran dibariya bêhna axa ku bi mehan ziwa

yezdanî pêşkêş dike û tu biryar dide ku tu li bihuştê ye.

Erê hevalno min bêriya welatê xwe kiriye, min bêriya dayika xwe kiriye. Wê çawa aram û tebata min bê.

mabû, hesteke vejînê di dilê mirov de dida pişkivandin.

İro her çiqas ez bi hezaran kilometre ji welêt dûr bim jî, bêhna nanê tendûrê hîn bêhtir tê pozê min.

Li devê Çemê Reşan kaniyeke avzê hebû, min xwe qirûs dikir û av jê vedix-war û dema carina bêzar dibûn em dike-tin avê, me masî di-girtin. Li kîleka çem dehlek hebû, li tenışta dehlê jî baxçeyekî firingiyan hebû. Maisiyê ku me digirtin me li wir li ser agirekî ji darên hîşk dibîrişatin.

Germa havînê û xwêdana li canê mirov dida, wekî misk û enberê xwe dida derive. Wêneyên welat her roj hîn pirtir li ber çavêr min diherin û tê...

Ya xweda!

Ev ci evîn e di canê min de, min bêriya axa welatê xwe kiriye, ez naxwazim li vê biyaniyê bimîrim.

Ditirsim, belê ditirsim, li vî welatî bêgane bimîrim, naxwazim bi tenê bimîrim.

Li welatê xwe li ser axa bav û kalêن xwe di rojeke biharê de dixwazim li ser mîrgek, li ser pişte vezelim û li ezmanên welatên xwe yên bilind û bêstûn binihêrim. Wê demê mirin, mirin nîn e, mirin xem nîn e...

Hûnê bibêjin çîma tu qala mirinê dikî? Ji ber ku ez jiyanê bi mirinê fêm dikim.

Li Kurdistanê xweza, serma, germa-hî, bihar û payizê bi hev re bi semayeke

yezdanî pêşkêş dike û tu biryar dide ku tu li bihuştê ye.

Nizanim careke din dema em li dora tifîkê civiyabûn, çavêr me li sersotê agir kûr û dirêj dînhîrî û em difirîyan di xewnen şevan de

Careke din ez ketime gerînaka demê Zîz dibe şev... Destarê çerxa felekê dihêre dihêre.. Bayê kûr rabû didêre û didêre derd û kulên min didêre Simbelê cemed girtî, dayê min, sare

Ü bihara rengîn hat, di danê beyan de pez li ser xwêdanîka marîna berxane wekî qiyametekê ye.

Şev dema hişyariya hestên dilan e.. Dibe ku tu bibêjî ji dil.. belê ji dil İro zarokê li Kampa Etrûşê bi çavêr melûlî li min dinehîrî,

Hêviyên min weke çirayên demen bîhûrî zelûl in û pir bi dûman in.

İro tu wekî berfineke keleş li qûntarêni çiyan, pejna te li ber çavêr min... Neke tu berfi, neke berf tu bi xwe yî. Li ser pelgân te dilopên avê bi tîrêjîn rojê yên şeveqê li dora xwe mîna elmasrengan belav dibin.

Dilopên daktevin devê çem, xuşa avê wekî melodîya loriyeke ku dayik ji zarokê xwe re dibêje, kete kerika guhê min. Çivîkek hate xwe danî li ser milê min û min nikulê wê ramûsand û fîriya çû ber bi semayen kûr û valave...

Zarokekî biçûk bûm min li her tişpi bir li baldarî dînhîrî, rûniştibûm li ber pacê rûniştibûm, li derive berf dibariya,

min kuliyyen berfî takîb dikir, ka gelo li hev dikevin an na... na na li hev nakevin.. ji ber ku li hev biketina, digotin wê dinya xera bibe.

Darekî biçûk di destê min de hebû û min agir di tufikê de tev dida, dapîra min go ezê ji te re çirokekê bibêjîm, di-be ku tu jî rojekê ji kurên xwe re bibêjî;

Çirokê çîvanokê/ rûnê rokê kete ci-hokê/ cihok miçiqî/ mele pix kir karê/ kar melisi, gur fetisi... dapîra min ya delal nizanibû ku ev dijminê mirovahîyê, wê xewnen me jî, çirokê me jî tarû mar bike...

İro kela kîna min li vî dijminê ku xewna min xerab kiriye rabûye.

Kela dilê min rabûye wekî lehiyên Fîratê..

Kîna dilê min dibe evîn û di qefesa dil de hilnayê.


Dixwazim bifire bi bal çiyan ve, wekî kewekî di qefesê de.

İro min digerîne ber bi cewherê min ve

Ü min wekî bablisokekê di nava bîra min de zîz dike.

Şev baş ta şevbihêrkeke din.

RÊŞAD AMEDÎ



Li navendê çandê çalakiyê vê hefteyê  
Li NQM'ya Stenbolê

- **15.06.97 Yekem:** Bernameya bîrânîna Ahmet Arif. Helbestvan: Şükûr Eraş û Yusuf Hayaloğlu, saet: 14.30 Konser Ozan Xanemîr, saet: 18.00
- **18.06.97 Çarşem:** Panela İnstîuya Kurdi: "Rewşa Weşanxaneyên Kurdi" bî Beşdarvan: Doz, Komal, Deng, Nûjen û Berfin.
- **20.06.97 În:** Film: Kar(îş). Derhêner: F. A. Akıncılar, saet: 15.00 Filmî Belgeyî yê İsmail Beşikçi "36=13 Girtigeh". Derhêner: Ahmet Soner, saet: 18.00
- **21.06.97 Şem:** Konsera Koma Gulen Xerzan, saet: 14.30

Ekin Sanat Tiyatrosu "Carrar Ana" nîn Tüfekleri (Tivingên Dayık Carar)"  
saet: 18.00

Li NQM'ya Izmir'e

- **15.06.97 Yekem:** Konsera Koma Gulen Xerzan saet: 14.30 - 18.30
- **20.06.97 În:** Şano "Bayê Elegazê" Şanoya Hêlin, saet: 18.30
- **21.06.97 Şem:** Konsera Fevzi Kurtuluş, saet: 14.30 Şano "Bayê Elegazê" Şanoya hêlin, saet: 18.30
- **19.06.97 Pêroşem:** Film "Mississippi Yanyor" Derhêner: Alan Parker, saet: 18.00

## AWIR

# Şewa payştgeniya HADEP



**S**axa Partiya Demokrasiya Şâri (HADEP) ya Zeytinburnu 8'ê gulan de Restaurantê Karides de jû şewa nanîn kerd hedre û nézdiye 700 mardimî amey şewa HADEP'a Zeytinburnu.

Qiseyê akerdinê şew Serokê HADEP'a Zeytinburnu AliCan Önlü kerdî. Önlü qiseyandê xo de vat ke, hetañî nika nê serê limînê de mayê kurdan bermayê, la belê operasyonê başûrê Kurdistanî, taybeti jî warodayinê helikopteran dima mayê tirkânê jî bermenê. AliCan Önlü da zanayin ke, wexto ke mayê kurdan bermayê, mayê tirkân bêveng mendê û bermayinê kurdan nédiye. Bewnê ewro jî mayê tirkân bermenê, labelê mayê kurdanê bermayinê mayanê tirkân bêveng némanenê û wazanê ke no şero lîmin biqedîyo. Fina Önlü wast ke dewleta tirk operasyonê Başûr vindarno û wa artêşa xo Başûra banco.

Serokê HADEP'a Zeytinburnu peyra, Sekreterî HADEP'a Stenbolî Cemal Coşkunî qisey kerdî. Coşkunî bandorkendena başûrê Kurdistanî protesto kerd û wina vat: "Bakurê Iraq rê operasyon viraştin mesela kurdan çareser nebêna. Mesela kurdan ser ma veri vat, mayê nika jî vam, mesela kurdan

raya demokrasî û siyasiya çareser bena û coka jî mayê vam, wa dewlet hemâ nê operasyonî virado û wa raya demokrasî û siyasiya çareser bikro."

Fina Sekreterê HADEP'a Stenbolî da zanayin ke dewlet verî jî başûrê Kurdistanî rê operasyon viraşt, la belê teva nêkewt ci dest. No operasyon ê bînan ra xerabtir o, çimkî nê operasyonî miyan de destê Amerîka û İsrail estê. Nê dewlet wazanê Rojhîlat Navîn de ariyeyê xo bidê geryayin.


Cemal Coşkunî racenayina HADEP ser jî wina: "Ewro dewleta xo vana demokrasiyan de çarey nêqediyenê. Raşto mayê jî vam demokrasî de çarey nêqediyenê, de o wext kerem kirê raceñê. Şima DEP racenê, nê şâri HADEP nê ro. Şima Hatip Dicle eyşt zere, nê şâri xo miyan ra Bozlak vet. Şima HADEP racenê, Bozlakî çekrê zere, no şâr DEP'an, HADEP'an, Hatip'an, Bozlak'an xo miyan ra vejeno. De kerem kirê racenê çiçî do şima dest kewo."

Şewa Zeytinburnu de Hunermendê NQM' Hozan Xanemîr (Hawaryûm), Koma Agirê Jîyan û Metin Kahramanî deyrana (kilamana), Teatra Jiyana Nû şanoya, Koma Serhildan jî govenda şîlik (girse) kefweş kerdî.

MEMED DREWŞ

## TÎŞK

BEKIR BAHÖZ



## Dagîrkirdinî başûrî Kurdistan

**S**upay Turkiye rojî 14'î gulan, be ber çawî hemû cîhanewe û be deyan hezar serbaz û tank û top û firoke û helikopterewe, pelemarî başûrî Kurdistanî da û besêkî zorî ew parçeyey Kurdistanî dagîr kird.

Turkiye her le seretawe raygeyand ke giwaye ew hêrişê le ser daxwazî Partî Demokratî Kurdistan (PDK) destî pê kirave, giwaye PDK hêrişî kirdote ser gerîlakanî PKK û bo pak-kirdinewey herêmeke, daway hawkarî le Turkiye kirdiwe.

Sereta PDK lew bareyewê bê deng bû, çünke lewe deçê çi Turkiye û çi layenekanî tirî Başûr, lew bawere da bû bin ke gerîlakanî PKK xoyan bo nagîrê û her le heftey yekemî şereke da tefrütûna debin û hemû şitêk debrêteve.

Belam ke hêdî hêdî tep û tozî berekanî şer rewiye we û supay Turkiye zebrî tundî berkewt, edî rewşêkî tir hate arawe, be şêweyek ke PDK raygeyand ke we supay Tukiyey bo ser Başûr dawet nekirdiwe û heta kar be ewe geyîş ke PDK du car bangewazî aşî arastey PKK kird.

Her hemû em pêşkewtinane diway dê ke hêzakanî gerîla le seratay qonaxî diwemî şer da, be müsekî SAM-7 du helikopterî hêzî hewayî Turkiyayan berdayewe û ber leweş be Doşka, du helikopterî tiryân berdabowe.

Şan be şanî em pêşkewtinane, PKK le piştevey berekanî şer, peywendî xoy legel cemawar û heze şoressgêrekanî başûrî Kurdistan da pêş dexat û peyman û protokolî hawbeşîyan legel da mor dekat.

Eme la layek û le layekî tirewe, diway berdanewey helikopterakanî Turkiye, edî supa helikopter bekâr nahênenê le şer da, wate mirov çon temaşa dekat terazûy hêz be lay cengaweranî kurd da ye, bew core, nek her PDK, belkû xudî dewletî turk naçar debê çaw be siyasetî xoy da bixşenêtewe. Çünke Turkiye tiwanî niye bo mawekî dirêj le xwarûy Kurdistan bîmînêtewê û rojane serbaz bidat be sebaref be dabîn nekirdinî parey pêwist bo operasyoneke, nimûneyekî berçawî têkşikanî hêrişike ye. Ewe bû tenanet Erbakan-îş danî piya na ke supa be mebestî şardinewey doranekanî, hewl deda hêris bîkate ser hukûmet.

Çawdêrî siasî detwanê bilî Turkiye nek her neytiwanî bew hêrişê PKK le naw berêt û bes, belkû hêrişî emcarî supay Turkiye be hawkarî PDK, kurdi le dewri yet kokirdewe û le Kurdistan û her ciwar lay dînyawê narezayî û tureyi dabarı be ser Turkiye û hawkarî da. Turkiye baş têdebat ke hergiz natwanê be rîgeçarey serbazî, kîşey kurd çareser bikat.

# Memê gundî

**D**ikê berê sibehê, li ser kozika mirîkên Seyro (pîreka Memo, ji gundê Bewernê, li hêla bajarê Nisêbinê) bang da û bi bangdana wî re, çavên Memo bel bûn, pê re pê re sed sixef û kuffî kirin, berî ku pişta xwe di nav livinê xwe de biterqîne û şehdebûna xwe pê re bîne!...

Memo, pişti ku pişta xwe terqand û şehdebûna xwe anî, xwe ji nav koma kûfletê xwe, ji ber Seyro li rexê çepê û rîza zarokan li aliyê rastê kişkişand.

Sal li dûv salê, cihê lawê ji yê nexurî, ji cihê wî dûr diket û zarokê dî, diket şûnê û wilô, ew pênc sal bûn ku ji livinê bavê xwe dûr diket.

Memo, bi lez cilên xwe li xwe kirin. Çû çeleka sor ajot pêsiya gund, berda nav garana gund û vege riya her sê bizi-nen xwe jî kirin nav kérî, ji nûv re, du mist av li rûyê xwe kir û neh deh caran destê xwe, di ser simbelê xwe re bir û anî, serê wan pêça û tûj kirin.

Memo, tim henek dikir û digot:

– Taştiya min bi efendiyê Nisêbinê re ye.

Gotina Memo rast bû, ji ber ku, karê wî li bajarê Nisêbinê pêk dihat, karê wî ji ew bû, ku bi aceleka (erebok) dehfandi-nê fêkî (mêwe) û hin şinahî, li nava bajarê Nisêbinê digerand, difirot û wilô kûfletê xwe, pê xwedî dikir. Rojekê dostekî Memo, kenî û jê pirsî:

– Memo, ci derdê te ye, ku tu wekî li-mêja sibehê, berê xwe didî bi ser mala memûrê polisan de û ji nûv re, dest bi fi-rotina meweyen xwe li nava bajêr dikî!?

Memo, bi dostê xwe re dikenî, lê ve-digerand û digot:

– Bira, ez her sibe, çar pênc lib tivir miriv diavêjim ber deriyê wî segbavî, be-rî ku cengena jina wî ji xewa xwe rabe û heger ez dereng gihiştîm, mala min kam-bax dike, karê rojekê giştîkî di xisara xwe dernaxim!..

İro Memo, berî bangdana dîk hişyar bû û bi giranî di nav livinê xwe de rû-nişt. Milê Seyro hejand, deng lê kir da ku herê wan sewalan bider (êm) bike. Seyro, çav girtî jê pirsî got:

– Te xêr e Memo?

Memo bi giranî çavên xwe xwirandin û got:

– Bi xwedê Seyro, min xewneke pir pîs û giran dit, laşê min tengijiya ji ber!

Her sibeh Memo, çar pênc qedeh çay bi nanekî tenûrî û bi sêniyek mast re dix-war û vedixwar. Lê, vê rojê, bê taştê ji mala xwe derket û berê xwe da bajarê Nisêbinê û dilxemgîn!..

Demsal, bihar e, danê bêriyê ye, Seyro bi bêriyavan re li nav keriyê pez bû. Kêlika ku bejna Memo jê ve xuya kir û ew dit bê çawa ji aliyê Nisêbinê ve, tena tena tê mal.

Cırkıñ ji dilê Seyro hat û ji tîrsa dilê wê hate guvaştin.

Di dilê xwe de got:

– Memo nehayîte belayê!..

Her sê bizinê xwe, bi lez dotin û be-re xwe da mal.

Memo derbasî xaniyê xwe bû û bangî Seyro kir, got:

– Seyro! Bi lez çayekê ji min re bide çekirin lê, serê min peqiyâ!..

Seyro.. Ba dida 皵pora gazê, agir pê ve dikir û di pê re jî, ji Memo pirs kir, li ser sedema zû hatina wî ji kar.

Memo bi keserê re, got:

– Seyro!.. İro ez hatim kuştin, lê Xwedê ez ne kuştı!

Seyro bi tirs, jê pirsî, ka ci büye?

Memo, mijek li cixara xwe da, bêhna xwe bi dûyê cixarê re berda û ji nû ve bersiva Seyro da û got:

– Berî ku ez bigihime ber mala memûrê polisan, tirimbêla wî hat peqandin, bû hezar çenî, ew û şifêrê (ajo) wî bi hev re hatin kuştı.

Seyro bêhna xwe, kişand û berda û got:

– Eê.. Ü ya te ci ye, Apociya ew bombe kirin, qenc û xweş kirin!

Memo bi dengekî tenegezar got:

– Ya min ci ye? Çawa mal ne xirabê, erê weleh qenc û xweş kirin, lê karê min xera bû, her roj min hin şinahi datanî ber deriyê wî, heya ku destûr dida min, ku ez di nav bajarê Nisêbinê de kar bikim. A niha, ezê çawa bikim û çilo bikim û ecelêka (erebok) min bênimro ye, lewre jî, qedexeye ku ez kar bikim!..

Seyro bi dengekî bilind, got:

– Eê.. Her ereboka xwe bi nimro bîke.

Memo serê xwe hejand û got:

– Ma ez dikarim, na çenabe ez nimro bikim. Ji ber ku ez gundi me, yê nimro bike, gereke li bajêr bijî û mala wî li bajêr be.

Memo hîn gotina xwe neqedandibû, cendirmeyan girtin ser mala wî. Pişti ku gundi jî hawîrdor girtibûn!.. Heya Memo, gihadin ba cipa xwe, ji his xistin û ci cara ku Seyro xwe diavête ser laşê wî, da lê nexin, ew jî didane ber pêhîn û qunda-xan.

Seyro bi her pênc zarokên xwe ve, bi tenê ma û pir tenegezar bûn. Nexusim di wê dema ku Memo li girtigehê bû, ketin nava derd û kulan. Lê, gelê gundi ev derdê han, ji ser milen wan hinekî ragirt û sivik kirin. Ji ber ku Seyro bi zarokên xwe ve, di jiyan xwe de, wilô qedir û rûmet ji rexê Bawernîyan ve, nedîtibûn û di wê qîmetê de man heya roja ku Memo nîv sax, avêtin ber deriyê mala wî. Ji ber ku, gelê Bawernî digotin Memo Apociye, lê madem ne kuştin û hat berdan, ev bawerî di nav wan de hat guherandin û digotin: “Memo ne Apoci ye!..”

Memo, ji gelê Bawernî re axivî û li ser sedema girtinê wiha got:

– Sedema girtina min ew bû ku, min ew bombe kirin!..

Çermê laşê Memo sîn û reş bûbû. Ji lêdana ku heftiyekê lê kiribûn. Seyro her sev laşê wî bi zeyta xwarinê difirkand, heya dikaribû di xew bikeve.

Ev roja pêsi ye ku, Memo ji mala xwe derket. Pişti berdانا wî û bêyi piş-ter-qandin, berê xwe da bajarê Nisêbinê.

Çûna Memo nava bajêr, dilê Seyro ki-re nav teqe reqê û ew diket tîrsa ku cendermeyen tîrk, dîsa wî bigirin. Lê Memo pir li bajêr nema, hat, derbasî mala xwe



bû, bang li Seyro û zarokên xwe kir, za-rokên xwe maç kirin û gote Seyro:

– Min ereboka xwe firot!

Pereyên ji mafê wê dane Seyro û hin bi xwe re hiştin û got:

– Hûnê xwe bi van pereyan mehekê du mehan biqedînin. Bi van pereyên ma-yî jî ezê li karekî dî ji xwe re bigerim!..

Careke din zarokên xwe kirin ber himbêza xwe, bêhneke baş ew bêhn kirin û dîsa ji xwe dûr xisitin û bilez li devê derî da, ji mal derket.

Roj li ber ava, li gundi Bawernî bû hawar û hate gotin ku, Memo êris bire ser polisan. Gelê Nisêbinê, şeva xwe bi guhdarkirina şerê wî derbas kir.

Memo, bi wan pereyên xwe, çek kiribûn û girtibû ser qereqola polisan û ew qereqola ku tê de hatibû girtin û işkence

dîtibû.

Hin ji polisan, li devê derî kuştin û hin pişti ku kete qijla wan, ode bi ode şerê wan kir. Heya kêlika ku hawara lesker daket. Tankê xanî bi ser serê Memo de anî xwar û laşê wî di bin de ma.

Seyro, bi zarokên xwe ve hat, li ser wî kavîlî mîma kundan, rûmîstîn û bi jariyê ke bêdengî digirîyan. Gelê Nisêbinê, bi dilşewatekê, di bin çavan re li wê û zarokên wê dinihêrin û kulîkîn sor ji bin ci-lîn xwe derdixistin û diavêtin ser wî ka-vîlî!..

Hevalên Geila, li ser çiyayê Gabarê ji hevalekî nûgihişti pirsün:

– Navê wî ci ye?

Bihêrs got:

– Memê Gundî!..

ABBAS M. ABBAS

# Încîla Yûhenna



ber ku wan heta niha belavokek ji bi kurdî dernexistine.

Di van salê dawî de bi xurtbûna tevgera netewe-yî re, kurd zêdetir bi doza xwe hesiyan. Her wiha ew ji berê xurtir li zimanê xwe xwedî derdikevin. Lewre ji kesen ku dixwazin mesajên xwe bigihînin gelê kurd weşanên xwe bi kurdî derdixin.

Piştî çapkirina pirtûka "Mizgin" a Lûqa, niha ji "Încila Yûhenna" ji aliye Kitab-i Muqaddes Şirketi ve hatiye weşandîn.

Încil (Yûhenna) ji yewnaniya kevn li zimanê kurdî (zaravayê kurmancî) hatiye wergerandin, lê navê wergêran nehatiye diyarkirin. Li gorî agahiyê di pêşgotina vê pirtûkî de, Încil cara yekemîn di sala 1872'yan de bi tîpêr ermenî li kurdî hatiye wergerandin.

Bi nîxandineke giştî mirov di-kare bi hêsanî bibêje, pirtûk bi zimanekî rawan û zelal hatiye wer-

gerandin. Her wiha pirtûk ji aliye dîbarî ve ji baş e. Lî, bi dîtina me, ji bo baştir têghiştina xwendevanan ku ferheng piçekî din bê fireh-tirkirin, wê çêtir bibe. Ji aliye kî din ve, ji bo ku taybetiya dînî ya pirtûkê xurtir bibe, pêwist e ku bêjeyên dînî wekî xwe bêñ parastin. Bo nimûne, ji bo kelam peyv, ji bo keramet hêzdar nehata bikaranîn, baştir dibû.

Wekî hin nivîs û weşanên din di vê wergerê de ji pêrkîta "bê-di" ne cihê xwe de hatiye bikaranîn. Di pêşgotina pirtûkê de peyva "bêhejmar" hatiye gotin ku ew ji ji "sayı-sız" a tirkî hatiye girtin. Bi dîtina me diviyabû "bi hejmareke ku mirov nikare bihejmære (uncountable)" bihata gotin. Her wiha awayê gotinê yê bi rengê "bi zimanê kurd hatiye wergerandin" ji ne di cihê xwe de ye, li gorî mantiqê kurdî diviyabû, "li zimanê kurdî" bihata gotin. Dîsa di kurmanciya jêrîn de "bo zimanê kurdî..." ji tê gotin.


Ji aliye kî din ve di pirtûkê de weki peyvîn nû herheyî (edebî) û perizîn (ibadetkîrin) bala mirov dikşînîn.

Pirtûk ji 115 rûpelan pêk tê û di dawîya pirtûkê de digel alfabe-yâ kurdî, ji bo standina dîtinê xwendevanen lepirsînek ji hatiye amadekirin.

SERWÎSA ÇANDE

## Hejmara nû ya Jiyana Rewşen

**H**ejmara nû ya kovara çand û hunerî ya NCİM'ê Jiyana Rewşen derket. Di hejmara nehan a vê kovarê de gelek nivîsîn li ser çand û hunerî cih digirin. Kovar bi pêşgotineke li ser da-girkirina başûrê Kurdistanê dest pêdike. Di vê nivîsî de li ser berpirsiya hunermend û ro-nakbirê n kurd di warê bilindkirina doza nete-weyî de tê rawestîn.



Ji bili vê nivîsî gelek kesan bi pexşan, hel-best û nivîsîn xwe yên lêkolînî di nava rûpelân Jiyana Rewşen de cih girtine. Her wekî hejmaren din, di vê hejmaren de ji çirokeke Hesen Zinar, bi navê "Bûka Welêt" cih digire. Dîsa çiroka "Derwîş Beg û Xezala Mendol Axa" bi beşa xwe ya 3'yan di vê hejmaren de ji didome. Digel kesen weki Cemil Denli, Fevzi Bilge û Nejat Ayaz, Hamdullah Baki û M. Zahir Kayan ku ji bo xwendevanen rojnameyê nas in, navê ji bo xwendevanê kovarê nû yên mîna Çiya Mazî, Zeynep Yaş, Abbas Alkan, Kawa Nemir, Ebdur-reqîb Yusuf, Ibrahim Aydoğan, Pîr Rustem, ji di vê hejmaren de cih girtine.

## HADEP û REFAH

OSMAN ÖZÇELİK



**H**inek kes dibêjin HADEP baş e. Baş e belê zehf dişibe Refahî (Partiya Refah) û didomînin: Her çiqas HADEP laşîzmî diparêze ji, di nav hilbijêr û endamên HADEP'ê de gelek mirovîn İslâmî hene. İslamiyên HADEP'ê dixwazin partîyê bi ber REFAH'ê ve bikişînin.. HADEP deriyê xwe yên itfaqê ji Refah'ê re vekirî dihêle. Ev xeterêyeke mezîn e. Refah serkêsa kevneperestiyê ye. Armanca wan nîzamî şerîfatî ye. Şerîfat dijminê mirovatiyê ye. Mînakî a Talfîban û ya Çeçenan li ber çavan e.

Ev kes rexneyeke din ji dikin. HADEP aliye xwe yê çepgir qels dihêle. Li şuna enternasyonalîzmî, dide ser şopa kurdâyîtiyê. Xelasî di sosyalîzmî de ye.

Yêvan rexneyan dikin bi piranî kurd in û di nav rîexistinê çepgirîn tîrkan de ne. Tew di ser de ji, hinek ji wan di nav CHP'ya Mustafa Kêmal de ne. Mixabin pirtîren van kesan kurdîn Alewî ne.

Hinek kesen din ji hêne ku, ji me HADEP'yan re dibêjin "We devê meşkê ber-

daye, hûn bi dû tasek dew dikevin" kurd İslâm in û em cûne bûne çepgir. Dînyayê dev ji çepgiriyê berdaye, me daye ser pişta sosyalîzmî. Me qad û meydan ji Refahî re hiştiye. Di hilbijartinê tevayî de dengen ku HADEP'ê standîne (% 4.2) nîşana têkçûnê ye, 20' milyon kurd Q ji sedî çar xal dudo! Divê HADEP li ola xwe û li gelê xwe vegere.

Ev kes wisa ji di fikirin. Dibêjin Refah ji li dijî kemalîzmî ye, HADEP ji. Çima Refah û HADEP bi hev û du re itfaqê nekin?

Wekî ku kurt fêhmîkîn ev biraderina ji kurd in. Belê kurdîn İslamparêz, Kevneparêz in. Ew ji, xwe li derveyê HADEP'ê û rîexistinê kurdan dihêlin. Mîna yên din tenê şîretan li me dikin. Xwe nadîn ber kar û bar.

Edî ji me re bûye vatîniyek (wezîfe) girîng ku em, cûdayetiya xwe û ya Refahî qenc eşkere bikin. Ji ber ku ev pişra hanê gelekkar an tê holê. Û ger mirov piçekî kûr nefikire cazi'beya li dijbûna kemalîzmî mirov dikşîne keminâ Refahî.

Divê em bipejîrinin ku (qebûl bikin) du rûyê kemalîzmî hene. Rûyê yekemîn nîjadperest e. Nîjadperestîya netewaya tîr! Ya ku dibêje "Xwezi bi wî kesî ku dibêje ez tîr im." Rûyê kemalîzmî yê ku kurdan û gelên din înakar dike ev e. Rûyê xwînmij û xwînrîj ev e. Em bi tevahî li dijî vê kemalîzma qirêj in. Rûyekî kemalîzmî yî din heye ku, tu fêdeya wê, ji me kurdan re tunebe ji, em dikarin vî rûyî piçekî pêşverû qebûl bikin. Ev rûyê

kemalîzmî yê nûjen e. Laîsizmek rast ne xercê wê be ji, ne şerîtxwaz e ji. Ger kemalîst rûyê xwe yê biqirêj piçekî biguhere, em dikarin têkiliyîn bisînor bi rûyê nûjen re deynin. Wekî tê gotin ev rû piçekî tê xwarin'

Heke mirov qenc bala xwe bidê, li ber çavên mirov zelal dibe ku, rûyê kemalîzmî yê biqirêj ji Refahî re bûye ideolojiya hîmî ya bingehîn. Û nav lê daniye "Millî Görüş" ango ideolojiya neteweyî!

Refahî rûyê qirêj girtiye û şûr li rûyê piçekî nûjen kişandiye. Refah bi nûjenîye û hemdemîye re şer dike. Berê xwe daye kevneperstiya rojhîlat.

Bi kurtî kemalîzmî, me û Refahî nêzî hev û du nake, dijî û nakokîyîn me derdixe holê.

Geli birano de werin 'çiv'an nedin xwe. Ne li ser navê enternasyonalîzmî û ne li ser navê 'ummet' xwe ji têkoşînê bi dûr nexin. Ji ber ku her du rî ji di welatparêziyê re derbas dibe. Heta mirov nebe welatparêz nikare bibe enternasyonalîst an ummetperwer.

Em dizanîn kurdbûn û kurdayeti zehf zehmet e,

De werin tîrsa dilê xwe bîskîni, bikevin govenda welatparêziyê û azad bibin. Xwe ji xapandina xwê bi xwe xelas bikin.

Di hembêza welatê we de cihê enternasyonalîstan ji, yê ummetperweran ji heye. Werin em bi hev û du re keskesorek bêhempa ava bikin ku her reng tê de serbixwê û bi hev û du re azad e.

# Diya min ne şehîd e



**D**i dema kuştina Medet Serhat de, ji bo polis cendekên wî ji mizgefête nerevînin, li DEP'a Bağçilarê hinek amadehî têñ kirin. Kesên berpirs, berî rakirina cenaze bi du saetan 6 heval şandin ber deriyê mizgefête, da ku cendekê Medet Serhat bipê.

Kesên ku peywirdar in dibînin ku wa ye, erebeyek ji mizgefête derket û li ser ji tabûtek heye. Ji wan kirî ku polis cendekê Medet Serhat direvînin, hema xwe diavêjin pêşîya erebeyê, bi tiliyên

ku nişana serkeftinê dikin û dest bi sloganen "şehîd namirin" dikin. Xwediyê kesa ku miriye li hemberî vê rewşê dîminin heyîrî û mîrikê ku diya wî miriye, dibêje "lawo we xêr e, hûn ji me çi dixwazin, diya min bi ecelê xwe miriye, şehîd nebûye." Li ser vê gotinê hevalên ku sloganan diavêjin, rewşê fêm dikin û dev ji sloganan berdidin, ve digerin cihê xwe.

## De ka bila yek mezîn bibe

Malbatek ji kurê xwe re keçikê dix-

waze. Keçika ku dixwazin bi xweşîkî biqiliya xwe gelekî nav û deng daye. Malbata keçikê, wê didin wan. Ew ji pişti demekê radibin dest bi dilanê dikin. Diçin bûka xwe li hespê siwar dikin, didin ser riya mala xwe. Li ber deriyê malê ba ji ber bûkê diçe. Hemû berbû bi vê yekê dihesin. Xesûya bûkê li ber wê sekinî ye, ji bo ku şerma bûka xwe bibe, dibêje: "Dema li ber mala zâvî ba ji ber bûkê biçe, zariyê ku bîne kur e." Li ser vê yekê bûk ji xesûya

xwe re dibêje:

- Ez yeke din jî bikim?

Xesû dibîne ku niyeta bûkê xerab e, dibêje:

Na keça min, vî bi dê û bav mezin bike paşê.

## Fitûya Melekutan

Di dema Remezanê de miroveki nexweş heye. Ji ber nexweşîya xwe nikare rojiyê bigire. Lewre jî diçe ba Mele ji bo ku ew fetwayekê bide wî, da ku ew hindik rojiyê bigire. Mîrik ji Mele re dibêje:

- Mela ka fitû bide min da ku ez du rojan bi tenê rojiyê bigirim. Lê Mele vê yekê napejirîne û dibêje:

- Qet nebe divê tu 15–20 rojan rojiyê bigiri. Mîrik bi mele re dikeve bazara hejmara rojan. Lê dike nake, Mele ji gotina xwe nayê xwarê. Li ser vê yekê merik hêrs dibe û dibêje:

- Mele, tu herî zehf çend rojan dadikevî ka bibêje, binê meleyê Melekutan ji bo ku fitûya sê rojan bide, lotikan diavêje.

BERHEVKAR: HAWARYÜM


## BIXELAT...



### Bersiva Xacepirsa 70'yi


Xacepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigîhîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 72'yan Pirtûka Celalettin Yöyler (Gelperwerî û Nijadperestî) ye Jérenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirkandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava quityîn li bin xacepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xacepirsa hejmara 70'yi pirtûka Osman Aytar Kurdistana bi fiftî-fiftî qezenc kirine. Murad Aslanhan/ İstanbul, Rezan Yıldız/ İskenderun, Salih Dinç/ Batman, Canan Karahan/ Amed, Hasan Saya/ Tokat

## XACEPIRSA BIXELAT (72)





Fermandarê ARGK'ê Şemdîn Şakîk:

## Jûjî bi dûvê mar girtiye!

Berî niha bi mehekê, li Kurdistanê şer ketibû merhaleyeke xitimandinê. Ne me taktikên şer li hemberî wan pêşxistibûn ne jî wan li hemberî me. Herdu alî jî mîna şerê jûjî û mar hatibûn hemberî hev û sekinibûn. Nikaribûn xwe biavêjin ser hev, nikaribûn ji ber hev jî birêvin. Çimkî wexta mar bireviya wê jûjî bi dûvê wî bigirta, wexta jûjî bireviya wê mar pêveda. Demeke sekinin çebû. Terefek şer li aliyeke rovî xwe livand, çawa bi qemçika mar girt xwe kişand hundir. Belê ev 30 roj e ku mar xwe li ser û çavê jûjî dixe û xwe di nava xwînê de dihêle. Wê gavê jî dixwaze qemçika xwe ji devê rovî derxe xelas bibe.

Dewleta tirk, tu car bawer nedikir ku emê li hemberî wê bi taktikî şer bikin. Xetayekî weha kir ku em ji şer fêhm nakin. Bi vî awayî hate ser me. Wexta ku kete başûr, gote ezê herim wan ji kozikan derxim, emê di kozikan de li hember hev şer bikin. Wexta ku şerê kozikan çêbibe bi vê hejmar û teknikê emê di mehekê, du mehan de wan biqedînin. Feget hat hat hat tiştek nedît, ket nava valahiyekî pir mezin. Gir û çiyayê vala zeft kirin. Zaferke wisa sexte ilan kir. Xwe li ser wê zafera sexte jî hinekî serxweş kir. Hinekî jî xwe belav kir; di vê merhaleyê de gerîla xwe derxist holê. Ev merhaleya yekemin bû û me ev merhale qezenc kir. Qezenckirin jî ev bû; ew di êrîşê de bûn, em di müdaafayê de bûn. Gerek e wan neticeyekî mezin bigirta, lê ji ber ku me windahî nedan ew jî ji bo me qezenc bû.

Merhaleya diduya me guman dikir ku wê pir

dirêj dom bike, di vê demê de jî me digot "emê li hemberî hev hesabê 'hezar sal' ji hev bipirsin." Lê belê em vêga dibînîn ku ew merhaleya diduya jî wê di demeke kurt de biqede. Heta em dikarin bibejîn qediyye jî. Ji ber ku li gorî çavkaniyêne, em dibihîzîn ku dewleta tirk bi paş vedikişê. Kişandina wan jî wiha ye: Ew belawela direvin. Helikoptera ku ket, bi tenê ketina helikopterê bû. Bi vê helikopterê re rêveberen şerê Başûr û bi wan re jî Operasyona Başûr bi xwe ket. Ev bû 2 helikopter ku bi SAM-7'an dikevin, 2 helikopter jî bi Doçka'yê hatibûn xistin, jixwe ew veşartin. Bi xistina helikopterê ji hêla me ve, qeweta wan a eslî ji destê wan derket, jixwe tevahiyê operasyonê di nav van helikopteran de dihate meşandin. Nan, av, cebilxane û cilîn leşkeran bi wan helikopteran dianîn. Birîndar û kuştiyên xwe bi helikopteran dibirin nexweşaneyan. Bê helikopter nikarin derkevin ser girekî û dakevin.

Wexta ku li jor şer baş bimeşîn, lî jêr jî ji wan re dibe moral. Helikopter cesaretê dide wan. Bi ketina helikopteran gotin "60 heb fûze di destê wan de hene", dengê Almanya got "600 heb hene", belê di destê me de gelek fûze hene, ewê bén bikaranîn jî. Ji iro sün de jî wê asîmanê Başûr ji hêla gerîla ve wê bê parastin. Ev jî mizgîniya gerîla ji gelê Kurdistanê re ye.

Ji KDP'ê re jî gotibûn 'emê ji vir ve bê, hûn jî, ji wir ve, emê di demeke kin de neticeyekî pir mezin bistînîn.' PDK sozeke wiha

dabû. Bi duristî jî dabû, ji dil jî dabû, lê belê di pratikê de pêk neanî. Cepheya PDK'ê di vî warî de vala derket, ji ber vê yekê dewleta tirk ji hêla hêzîn PDK'ê ve hate xapandin. Di nava dewletê bi xwe de jî mişkûlat çebûn. Qorîciyê bakur hinek ji wan li ser hidûd man, hinek vekişyan; qorîciyan di vî warî de pir baş kirin, qet nebe canê xwe xelas kirin. İro dewlet di başûrê Kurdistanê de nikare xwe biparêze. Em dikin ku dermekeve, lê ku derkeve jî qeweta gerîla li ser e, vê gavê Zap ji bilî 2-3 niqteyan hatiye paqîkirin. Heta, Metîna jî hatiye paqî kirin. İxanetek pir mezin li hemberî me heye, gelê Kurdistanê jî dibîne, dibihîse û ji 7 salî hetanî 70 salî hemû kes li hemberî vê xîyanetê heta qirikî tijî bûne.

Gerek e ewil Mesûd lêborîna xwe bixwaze û xwe teslimê edaleta gelê kurd bike. Xwe bi welatparêzê Kurdistanê re yek bike, eleqeya xwe ji dewletê tirk qut bike. Gerek ji bo gelê kurd li bakur û başûr ji bo xebata siyasi nebe asteng, divê Mesûd, dev ji ajanên wekî şerâfetin Elçi berde.

Ji bo qetîlîma Erbilê (Hewlîr) ez nîzanîm wê PDK çawa ji bin wî barê giran derkeve. Ji gelê kurd re wê karîbin izah bikin? Ji dînyayê re wê karîbin izah bikin? Sûcê komutanê sirpan jî, wekî yê Barzanî ne giran e. Ji ber ku komutanê sirpi birîndar qetil nekirine. Li Başûr û Bakur wê dewlet teng bibe, gerîla jî wê herêmîn azad berfirehtir bike.

## Ferhengok

**amûr:** enstrûman  
**ast:** sekiye  
**avasazî:** mîmarî  
**ban:** serê xanî (dam)  
**binecîh:** baregeh, (üslenme noktası)  
**beje:** pevv, wişe, (kelime)  
**cure:** celeb, çeşn, çeşid  
**darbest:** tabût  
**derfet:** îmkan  
**dewlemend:** zengin  
**dijwar:** zehmet, zor  
**dijîf:** dijayedî (karşılık)  
**dûgel:** dewlet  
**ferîste:** melek  
**gîyanî:** ruhî

**noker:** xulam, (uşak)  
**pêkdar bûn:** siwar bûn  
**pêwist:** hewce, pêdivî  
**pêpelük:** qonax, merhale  
**plansaz:** planlaşıcı  
**raman:** hızır, fîkr  
**rûxandin:** hilweşandin  
**ravekîrin:** izahkirin  
**tolhîdan:** heyfîlanîn (intikam)  
**tomarkîrin:** qeydkîrin  
**vatinî:** peywîr, wezîfe  
**vîn:** irade (istenç)  
**wate:** mana  
**werz:** demsal, mewsim  
**xetere:** talûke

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yaynclîk  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNIŞAN

Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayin Yönetmeni)  
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karêن  
Nivîsaran

(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALÎH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHÎR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.S.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYÎN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpâyê:  
Mazhar Günbat

Tel: 00 32  
53 64 12 62  
Brûksel  
Suriye:  
Jan Dost  
Helim Yûsiv  
Berlin:  
Silman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçük  
49-5721-81360  
Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884  
Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564  
Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

# Artêşa Tîrk darbestan sparîş dike

Rewşa dawîn dide zanîn ku ji bo Artêşa Tîrk îcar daxuyandina serkeftineke qaşo jî, wê gelekî zehmet be. Lewre li gorî agahiyân, Artêşa tîrk sparîş 500 darbesten (tabût) din daye atolyeya xeratiyê ya Kolorduya 7'an. Ew atolye li Seyrantepeye Amedê ye. Wekî tê zanîn berê jî sparîş 600 darbestî hatibû dayîn.

**t**evgera dagirkirina Kurdistanê mehâ xwe tijî dike. Pişti pêpelûka yekemîn, di pêpelûka duymîn de aliyê terazuyê yê kurd, giraniya xwe dide pejiranîn. Dema mirov bala xwe dide daxuyaniyên derdorêni siyasi jî ew rewş diyartir dibe.

Pişti ku di 4'ê pûşperê de firokeyek (helikopter) hattexistin û tê de piraniya wan rêveberên şer, 11 kes hattin kuştin, Serkaniya Giştî yekemîn car li xwe danî ku du firokeyen wan ji hêla PKK'ê ve hatine xistin. Li vê daxuyaniyê raya giştî ya tîrk tevlihev bû. Serkaniya Giştî xwest ku heyfa vê têkçûnê ji Partiya Refahê bistînê, lewre jî da xuyakirin ku hikûmet pereyên ku ji bo operasyonê pêwist in, nade wan. Xistina firokeyê bandoreke wisa kir ku pişti daxuyaniyê çend rojan li ser operasyonê tu nûçe di televizyon û rojnameyên tîrk de derneketin. Li gorî nirxandina Fermandarê ARGK'ê Şemdin Şakîk ketina firokeyê xwedîyê wateyeke taybet e, lewre hemû pêdiviyê hêzên li Başûr bi firokeyan têne cih. Gava artêş nikaribe firokeyan bi kar bîne, ew nikare tiştekî bike. Jixwe li gorî agahiyân, kesen di firokeyê de bûne, plansazên tevgera dagirkirinê bûne. Dîsa rojnameya Cumhuri İslâmî daxuyand ku 4 serbazên giregir ên Îsrâlî jî di firokeyê de bûne, ew jî hatine kuştin. Tê gotin ku ew rastî, ji raya giştî hatiye vesartin.

Banga Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî ya ji bo aştiyê jî, wekî nîşana têkçûna hêzên tîrk li hemberî PKK'ê tê nirxandin. Li gorî agahiyân hêzên tîrk xwe ji gelek hêrêmîn ku berê ketibûnê kişandine û hêzên xwe ber bi sînor dikişînin. Rewşa dawîn dide zanîn ku ji bo artêşa tîrk îcar daxuyandina serkeftineke, qaşo jî, wê gelekî zehmet be. Lewre li gorî agahiyân, Artêşa Tîrk sparîş 500 darbesten (tabût) din daye atolyeya xeratiyê ya Kolorduya 7'an. Ew atolye li Seyrantepeye Amedê ye. Wekî tê zanîn berê jî sparîş 600 darbestî hatibû dayîn. Dîsa hate gotin ku Artêşa Tîrk sparîş kefenên mîna tûran jî dane Sûmerbankê. Lî hê jî Serkaniya Giştî ya Artêşa Tîrk idia dike ku wan 2500 gerila kuştine û ji wan jî li dora 30 kes hatine kuştin.

Li gorî agahiyên ku bi dest ketine li başûr û bakurê Kurdistanê gelek çalakiyên gerila çêbûne û gelek xesar giliştiye hêzên PDK û artêşa tîrk.

Hate ragihandin ku di 4-5'ê mehê de li herêma Zâpê şerîn-giran derketine, di van şeran de, bi taybetî li dora Girê Şîrîn ku lê firoke hatibû xistin, xesareke mezin giliştiye liêzên dewleta tîrk. Dîsa li herêma Haftanînê, li ser Çiyayê Prîz hêzên tîrk di şer de xesirîne. Li ser Girê Şehîd Cihâd jî gelek leşker hatine kuştin.

Hêzên ARGK'ê avêtin ser çeferen PDK'ê yên li Çomâlê. Di vê êrîşê de çar erebeyen PDK'yiyan hatin rûxandin. Hate ragihandin ku di vê bûyerê de 2 PDK'yi hatine kuştin, yek jî birîndar bûye.



Her wiha li bakurê Kurdistanê jî cerd û êrîşen gerîla yêni li ser binecîhîn dewletê zêdetir dîbin. Roja 2'ye pûşperê gerîla avêtin ser Erxaniya Amedê û bi çekîn giran li avahiyên saziyên dewletê xistin. Li gorî agahiyên ku niştecihîn bajîr didin, hînek polis di vê bûyerê de hatine kuştin û hînek jî birîndar bûne. Tê gotin ku polisîn birîndar rakirine nexweşxaneyen Amedê. Li gorî agahiyân gerîlayek jî li wir hatiye kuştin. Dîsa li Pesara di navbera Çewlik û Dara Hêne de hate ragihandin ku şer di navbera gerîla û leşkeren tîrk de derketiye û 4 leşker hatine kuştin, 5 leşker jî birîndar bûne.

Her wiha li pesara di navbera Qulp û Lîcê de konvoeye leşkerî kete kemîna gerîla, li wir Uzman Çawîşek û leşkerek hate kuştin, leşkerek jî birîndar bûne. Hate ragihandin ku li Sêrt, Şîrnex û Amedê di êrîşen gerîla de 12 cerdevan hatine kuştin.

Gerîlayan roja 5'ê pûşperê jî êrîşî ser avahiyên dewletê yên li Qulpê kiriye. Heman rojê li Nîsebînê gerîlayan êrîş birine ser erebeyekê tîmîn taybet, di vê bûyerê de tîmek hatiye kuştin, 3 tîm jî birîndar bûne. Dîsa di vê rojê de li sêgoşeya Dîcle, Erxanî û Çewlikê gerîlayan êrîş birine ser hêzên dewletê ku derketibûn operasyonê, di vê bûyerê de jî 2 leşker û du cerdevan hatine kuştin, 2 leşker jî birîndar bûne. Li gorî agahiyân di vî şerî de gerîlayeke jin jî hatiye kuştin. Hêzên gerîla li Bakur li gelek cihan rî birîne û nasname kontrol kirine.

Li gorî agahiyân roja 5'ê pûşperê li herêma Tirvanîş ku dikeve navbera Gelyê Amediye û Zapê hêzên gerîla dora tabûrek leşkeren tîrk girtine. Di çalakiyên gerîla de 7 leşkeren tîrk hatine kuştin. Yek jî wan yarbayekî bi navê Tolga Isa ye. Navê leşkerê ku hatine kuştin jî ev in: Mesut Doğan, Orhan Alagöz, Sedat Hoşgören, Salih Koç, Yunus Söylemez, Ahmet Gülen.

Li Haci Umranê gerîlayan avêtine ser qereqoleke PDK'ê û ew qereqol bi dest xistine. Tê gotin ku du kesen di qereqolê de yek jî fermandar, hatine kuştin. Na-

vê kesen ku hatine kuştin Aras Xursît İzzet (fermandar), İbrahim Mahmût Mîrza ye.

Li gorî agahiyên ku roja 9'ê pûşperê bi dest ketin, Artêşa Tîrk nikare hêzên xwe ji herêma Zapê bikişîne. Tê gotin ku li ser xeta Şkefta Birîndar û Xaregolê 1000 leşkeren tîrk ketine kemîna hêzên ARGK'ê. Li ser kemîna gerîla hêzên tîrk ji hev belawela bûne. Ji wan deh leşker hatine kuştin. Dîsa di şerî ku li Çiyayê Prîz derket de 10 leşkeren tîrk hatine kuştin. Her wiha gerîlayan li Sersingê êrîş birin ser hêzên PDK'ê. Li gorî gotina çavdîrân 10 PDK'yi hatine kuştin.

Tê gotin ku li Elbaka Wanê üsteğmenekî pê li mayîna gerîla kiriye û miriye.

Li gorî agahiyên ku bi dest ketine roja 10'ê pûşperê li Kurê Jahiro ku dikeve başûrê Gelyê Zapê, hêzên PDK'ê ji hêla gerîlayan ve hatine dorpeçkirin. Li vir gelek PDK'yi hatine kuştin. Li Haci Umranê gerîla êrîş dîbin ser hêzên PDK'ê. Erebeyekê PDK'yiyan ketiye kemîna gerîlayan, di vê bûyerê de PDK'yiye hatiye kuştin, yek birîndar bûye. Her wiha li herêma Lolan, di navbera gerîlayen ARGK'ê û PDK'yiyan de şer derketiye. Di vî şerîde li gorî agahiyân 16 PDK'yi hatine kuştin. Li herêma Ertûşê, di 10'ê mehê de, gerîlayen ARGK'ê li 10 cihan êrîş birine ser hêzên tîrk û tê gotin ku li dora 40 leşkeri hatine kuştin. Li gorî daxuyanîyen hêzên gerîla cendekî 20 leşkeran li erdê maye. Li devera Kanîmasî jî leşker ketin kemîna gerîla û li vir jî 7 leşker hatin kuştin. Dîsa di heman rojê de li navbera Basa û Cizîrê, gerîlayan êrîş birine ser binecîhîn leşkeran ên çavdîriyê. Hate gotin ku gerîlayan berî ku leşker bîn, mayînen ku ji dûr ve tê komandakirin bi cih kirine, pişti ku leşker hatine jî, ew teqandine. Di vê bûyerê de 6 leşker hatine kuştin.